# Zarokên DAIŞ`ê li kamp û navendên rehabîlîtasyonê

## (Metirsî, kêşe, û rêyên çareserîyê)




«Ew weke "xwîna nû" ya ku dê DAIŞ`ê ji nû ve vejîne, û li ser lingê wê bihêle, tên dîtin. Lewra, mayîna van zarokan di jîngeheke bi vî rengî de; dê careke din metirsîya jinûve-vejîna DAIŞ`ê derxe holê»

**Navenda Firatê ya Lêkolînan**

**Wergera ji erebî: Mistefa Mistefa**

## Pêşgotin

Dosyaya zarokên ku ji herêmên desthilatdarîya DAIŞ`ê, yên li Sûrîyayê, hatine derxistin, ji bo civaka xwecihî û navdewletî pirsgirêkeke mezin û metirsîdar e, çimkî gelek kêşeyê wê yên mirovî, qanûnî, ewlekarî û sîyasî hene. Ev yek li rex mayîna wan li kampan û di jîngeheke ji belavbûna fikirê radîkal û tundrew û sûcan re vekirî.

Tevî derbasbûna zêdetirî pênc salan di ser têkçûyîna erdnîgarî ya DAIŞê re, hîna jî çarenûsa zêdetirî 32 hezar zarok li gel dayikên xwe, û jinên kampên Hol û Roj û navendên rehabîlîtasyonê ne dîyar e. Ev yek li gel zêdebûna metirsîyên li herêmê ji alîyekî ve, û metirsîya li ser zarokan bixwe ji alîyekî din ve.

Di wextekî de ku hewla jinên DAIŞ`ê, bi taybet ên bi navê "Muhacîrat" li ser stratejîya veguherandina kampa Holê bo dewleteke piçûk a DAIŞ`ê berdewam e, her wiha zêdekirina hejmara zarokan û perwerdekirina wan li ser esasê fikirê DAIŞ`ê bi rêya gelek rêbazan, di serî de jî avakirina nifşekî nû ji "artêşa DAIŞ a paşerojê".

## Pirsgirêka lêkolînê

Pirsgirêka lêkolînê eşkerekirina alîyên xeterîya dosyaya zarokên DAIŞ`ê ye, ku roj bi roj xeterîya wan li kampan û li nav jîngeheke xwedî fikirekî radîkal zêdetir dibe, da ku paşê bibine weke bombeyên li ber teqînê. Li alîyekî din, lêkolînkirina kêşe û girêkên vê dosyayê, û gelo civaka navdewletî heta çi radeyê li hember vê dosyayê bi erka xwe radibe, nemaze di milê vegerandina malbat û zarokên ne sûrî an îraqî ber bi welatên wan ên resen ve. Her wiha nirxandina asta xeterîyên zarokên malbatên DAIŞ`î yên sûrî û îraqî li ser herêmê, di wextekî de ku guhdana bi wan di milê jinûve-perwerdekirinê de pirr kêm e.

Li ser vî esasî, em dikarin pirsgirêka lêkolînê bi vê pirsa sereke girê bidin: "Gelo xeterî û kêşeyên girêdayî dosyaya zarokên DAIŞ`ê li kamp û navendên rehabîlîtasyonê li Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê çi ne?".

Îcarê di vê lêkolînê de, em dê sedem û faktorên sereke yên vê kêşeyê bi rêya bersivdayîna pirsên li jêr, rave bikin?

- Faktor û sedemên sereke yên ku hiştin xeterîya zarokên DAIŞ`ê zêdetir bibe çi ne?

- Rewş û jîngeha kampan heta çi radeyê destekê didin zêdebûna xeterîya wan zarokan li ser herêmê ji alîyekî ve, û li ser wan zarokan bixwe ji laîyekî din ve, çimkî ew jî weke qurbanên şer tên dîtin?
- Gelo DAIŞ hewl dide stratejîya vegerandina "xîlafet"ê bimeşîne, bi amadekirina nifşekî nû ji zarokan, ku li kampan zêde dibin?
- Gelo erkê Hevpeymanîya Navdewletî ya şerê li dijî DAIŞê tenê bi têkbirina rêxistinê di biwarê leşkerî û erdnîgarî de sînordar e? yan jî divê ew berpirsîyarîyên xwe di rûbirûbûna bandor û bermahîyên ji DAIŞê, bi taybetî dosyaya bi hezaran zarokan li kamp û navendên rehabîlîtasyon û guhdanê bigire ser xwe?
- - Gelo nebûna berpirsyarîya welatên pêwendîdar ji bo vegerandina welatîyên xwe ji malbatên DAIŞê, van metirsîyan zêdetir dike û çareserîya doseya wan aloz dike?
- Çareserîyên heyî yên ji bo rêgirtina li ber metirsîyên zarokên DAIŞ'ê çi ne? Ma ew têr û bibandor in, an xeterî hîn jî hene û roj bi roj tevlihevtir dibin?

## Girîngîya Lêkolînê

Girîngîya vê lêkolînê di ronîkirina gelek xalên tarî yên dosyaya zarokên DAIŞê de, alozîyên wê û lêkolînkirina metirsîyan di hemû alîyan de ye. Her wiha, eşkerekirina kêşeyên herî girîng ên vê dosyayê di biwarên "ewlehî, civakî, derûnî, yasayî" û yên din de û vekolandina sedem û encamên van pirsgirêkan, ji bo pêşnîyarkirina çend çareserîyên guncaw ji bo vê dosyayê.

## Armancên Lêkolînê

- Lêgerîna li pirsgirêkên herî girîng di dosyaya zarokên DAIŞ'ê de li kampên Hol û Roj û navendên rehabîlîtasyonê li bakur û rojhilatê Sûrîyayê.

-Naskirina metirsîyên ku ev zarok dikarin li ser civakên xwecihî û navdewletî çêbikin.

-Destnîşankirina metirsîyên herî dîyar ên li ser van zarokan, ku weke mexdûrên şer û terorê tên dîtin.

-Destnîşankirin û pêşkêşkirina çend pêşnîyar û çareserîyên gengaz ji bo çareserkirina dosyaya zarokên DAIŞê.

**Rêbaza lêkolînê**

Lêkolîn xwe dispêre rêbaza wesfî û analîzkirinê ku armanca wê ew e; bûyer û geşedanên herî girîng rave bike û hejmar û serjimarîyên girêdayî zarokên DAIŞ`ê li kampên koçberî û navendên guhdanê pêşkêş û analîz bike; da ku bê zanîn gelo asta metirsîya wan zarokan gihîştîya kuderê, û pirsgirêkên herî berçav ên bi ser dosyaya zarokên DAIŞ`ê li Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê destnîşan bike. Li nik wê jî, nimayşkirin û dahûrandina çareserîyên demkî yên pêşîlêgirtina li ber metirsîyên zarokên DAIŞ`ê, û zanîna bikêrhatina wan a sînordarkirinê yan jî kêmkirina van metirsîyan.

**Plansazîya lêkolînê**

Li gorî tişta me li jor gotî, ev lêkolîn dê dabeşî du beşan bibe. Di beşê yekem de em ê giranîyê bidin kamp û navendên rehabîlîtasyonê, û di beşê duyem de em dê xeterîyên herî mezin û arîşeyên li ber çav ên girêdayî dosyaya zarokên DAIŞ`ê rave bikin, ew jî li gorî plansazîya li jêrê:

## Beşa Yekem: Zarokên DAIŞê di navbera kampan û rehabîlîtasyon û guhdanê de

### Mijara yekem: Zarokên DAIŞê li kampên Hol û Roj û pirsgirêka dabeşkirinê

Yek: Kampa Holê: Di navbera karakterê wê yê sivîl û dîyardeya leşkerkirina wê de.

Du: Kampa Roj: Yek ji rêyên heyî yên kêmkirina metirsîyan.

Sê: Rewşa awarte ya kampên Hol û Roj.

### Mijara duyemîn: Zarokên DAIŞ'ê li navendên rehabîlîtasyon û guhdanê

Yek: navendên "Hûrî û Orkêş"

Du: Navenda Hilat a rehabîlîtasyon û guhdanê.

## Beşa duyem: Metirsî û pirsgirêkên pirsa zarokên DAIŞê

**Mijara yekem: metirsîyên zarokên DAIŞê**

**Yek- Derengvegerîna zarokan bo welatên wan.**

**Du- zêdebûna jidayikbûnê.**

**Sê - Bikaranîna zayendî ya zarokan.**

**Çar - rîskên derûnî.**

**Pênc- paşguhkirina rehabîlîtasyona zarokên sûrî û îraqî.**

**Mijara Duyem: Arîşeyên pirsa zarokên DAIŞ`ê**

**Yek- Jidestdana hestê girêdana bi welatê xwe yê resen ve.**

**Du- Zarokên sêwî**

**Sê-Zarokên ji hin neteweyên cuda, lê xwedî yek dayîk.**

**Çar- Wernegirtina welatên erebî ji welatîyên xwe re.**

**Pênc- Mayîna zarokan bi dayîkên xwe yên tundrew re.**

**Dumahîk: Encam û pêşinyar**

## Beşê Yekem

## Zarokên DAIŞê di navbera kampan û rehabîlîtasyon û guhdanê

Tevî ku kampa Holê di destpêka xwe de weke kampeke penaberên îraqî û koçberên sûrî yên ku ji ber şer û xeterîyan revîyabûn hat avakirin, lê şikestina DAIŞ`ê li Baxozê, bandoreke mezin li nifûsa niştecihên kampê kir, çimkî bi hezaran ji jin û zarokên DAIŞ`ê li kampa ku jixwe tijî bû, hatin bicihkirin, îcarê di nava kampê de îroroj tu hem kesên ku ji ber DAIŞ`ê revîyane dikarî bibînî, hem jî malbatên DAIŞ`ê û kesûkarên bi ser wê vê.

Bi armanca kêmkirina zextên li ser kampa Holê, Rêveberîya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê beşek ji malbatên DAIŞ'ê û zarokên wan ên bîyanî veguhestin kampa Roj a li gundewarê Dêrikê, ku tê de gelek malbatên penaberên sûrî û îraqî jî hene.

Eger beşa penaberên sûrî û îraqî karekterê xwe yê sivîl û mirovî biparêze, wek kampek ji bo koçber û penaberan, çi pênaseya yasayî dikare bi beşa malbatên DAIŞê re were girêdan? Gelo ev xwezaya awarte ya van kampan nebû sedema zêdebûna metirsîyên zarokên DAIŞê?

Ji alîyekî din ve, û di ber parastina zarokan bixwe de, û ji bo pêşîlêgirtina li ber xeterîyên wan, Rêveberîya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê navendên guhdan û rehabîlîtasyonê, weke çareserîne demkî, ava kirin heta ku çareserîne domdar ji wan re bên dîtin. Lê dîsan jî, gelo ev navend têra tevaya zarokên DAIŞ`ê dikin? Her wiha gelo bernameyên wan ên rehabîlîtasyonê dikarîn heta niha armancên xwestî bi cih bînin an na?

Li vir, em dê di mijara yekem a ji lêkolînê de  rewşa zarokên DAIŞ`ê li kampan vekolin. Her wiha di mijara duyem de em dê balê bikişînin ser bandor û karînên bernameyên rehabîlîtasyon û guhdanê yên kêmkirina xeterîyên zarokên DAIŞ`ê.

## Mijara yekem: Zarokên DAIŞê li kampên Hol û Roj û pirsgirêka dabeşkirinê

Zarokên DAIŞê di navbera du kampên sereke yên bakur û rojhilatê Sûrîyayê de bi navên "Hol û Roj" de hatine belavkirin. Bi danberhevîyeke hêsan di biwarê îdarî û ewlekarî de di navbera wan kampan de, em dibînin ku rewşa zarokên kampa Roj ji wanê li kampa Holê dimînin baştir e.

### Yek- Kampa Holê: Di navbera karekterê wê yê sivîl û dîyardeya leşkerkirina wê

Ev kamp ji penaberên îraqî di destpêka sala 1991`ê, di şerê Kendavê yê duyemîn de, hat avakirin, û paşê di sala 2003`an de, piştî dagîrkirina Îraqê, careke din li pêşîya penaberên îraqî hat vekirin, ku ev kamp ji sê kampên sereke yên li ser sînorê sûrî-îraqî ye.[1]



Wêneyekî esmanî yê kampa Holê (2021)

Heta dawîya sala 2018an, nêzîkî 10 hezar koçberên sûrî û penaberên îraqî lê dijîn, lê piştî ku DAIŞê di biwarê erdnîgarî de li asêgeha xwe ya dawîn, li bajarokê Baxozê, têk çû, bi hezaran malbatên çekdarên wê hatin veguhestin bo vê kampê. Êdî pir berfireh bû, û di wê demê de nêzîkî 74,000 kes tê de bûn.

[1] Raporeke Tora Erebî ya BBC ya bi sernavê "Kampa El-Hawl: Sitargeha Dawî ya Jin û Zarokên "Rêxistina Dewleta Îslamî" https://www.bbc.com/arabic/middleeast-47319661, herî dawî di 12ê Hezîranê de hat serdan. 2023.

Piştî vê berfirehkirina kampê, kamp bû 7 beş, ku her yek ji wan weke "sektorek" tê binavkirin, piştî ku di van salên dawî de çend beş ji koçberên sûrî û penaberên îraqî ji wir hatin derxistin, kamp ji nû ve bû 6 beş. Beşek ji bo jinên "Muhacîrat" ên DAIŞ'ê, jê re "pêvek" tê gotin, beşên mayî jî sûrî û îraqîyan[2] dihewîne, tevî malbatên ku bi rengekî ji rengan bi DAIŞ'ê ve girêdayî ne.



Hevseroka birêveberîya kampa Holê, Cîhan Henan

Ev kamp, ji kampên herî xeternak li cîhanê ye, hejmara niştecihên wê zêdetirî 51 hezar kes e, û rêjeya tundrewîyê û sûcan li wir pirr zêde ye; ji ber ku jinên herî tundrew li cîhanê lê bi cih in, ku van jinan kamp veguherandina "dewleteke piçûk a DAIŞ`ê", û di encamê de kampa Holê bûye girêkeke ewlekarîyê ya kor, lewra em dikarin bibêjin ku DAIŞ`ê dikarî rengek ji rengên desthilatdarîya xwe ya îdolojîk, rêxistinî û civakî li wê deverê bisepîne.

Dema mirov derbasî kampê dibe, dibîne ku bi hezaran jin bi rengê reş serrûgirtî ne, û zarokên wan xwedî rêûresim û rengên çerm ên cihêreng in, ji zêdetirî 60 nasnameyên hemwelatîyê ne, îcarê mirov hîs dike ku ew derbasî dewleteke piçûk, metirsîdar û ji cîhanê qutkirî dibe, ne mîna ti kampeke koçberîyê ye, çimkî niştecihên wê bixwe dixwazin qanûnên xwe li ser tevaya kesên li wir ferz bikin, an bi rêya belavkirin û dana fikirê

[2] Daxuyanîya taybet a Hevseroka Rêveberîya Kampa Holê Cîhan Henan ji Navenda Firatê ya Lêkolînan re, 29.03.2023.

DAIŞ`ê, weke çawa bi zarokan re dikin, yan jî bi rêya tirs, kuştin û qewetê, weke çawa bi mezinan re dikin.[3]

Kamp bi gelemperî ji bo parastina koçber û penaberan ji şeran hatine avakirin, û bi karakterê xwe yê sivîl û mirovî li gorî yasa û normên navneteweyî têne dîyarkirin, lê tiştê ku di derbarê kampa Holê de tê zanîn ew e ku ber bi leşkerkirinê ve diçe, û ji alîyê şaneyên DAÎŞ'ê ve weke hawirdoreke guncaw ji bo domandina qaşo "xîlafeta" xwe tê bikaranîn.

Gelek sedem û faktor hene ku dihêlin kampa Holê ber bi leşkerkirên ve biçe, û DAIŞ wê ji bo stratejîya xwe bi kar bîne, her wekî:

**Cihê kampa Holê:** Dema kamp dûr û ji hêla qanûnî ve gelekî ne asê be, wê demê dibe yek ji arîşeyên herî mezin li pêşîya ewlekarîya kampan. Îcarê halê kampa Holê jî ev hal e, li herêmeke bîyabanî û dûr e, di salên borî de rastî gelek mercên ewlekarîyê yên zehmet hatiye. Ev kamp di nava rûbereke berfireh de ye, gelek grupên konan lê hatine vedan, ne gelekî dûrî sînorê Iraqê ye, ku ya dawîn bixwe jî hîna êşa tevlihevîyên ewlekarîyê yên paşmayînên DAIŞ`ê dikêşe, çimkî DAIŞ`ê derdora 5 salan ew herêm kontrol kiribû. Her wiha, ji alîyekî din ve, cihê kampê yê hesas û ne li gorî pîvanên navdewletî bandoreke xwe ya mezin li ser derbaskirina çekan û derxistina kesan bi awayekî qaçax ji kmapê û bo hundirê wê jî kiriye.

Mezinahîya Kampê: li gorî gelek lêkolînan, têkilî di navbera mezinahîya kampan, dîzayin û dîyardeya leşkerkirina wan de heye, çimkî lêkolîn dibêjin ku gerek e her kampek ne zêdetirî 20 hezar kesî vehewîne, lê desthilatên ku serperiştîya kampa Holê dikin, ti girîngî nedane van lêkolînan, lewra li gorî serjimarîya herî dawîn a kampa Holê, halê hazir derdora 51 hezar[4] kes li kmapê dijîn, û ev yek ne li gorî karîna vehewîna wê ye, ku tenê dikare derdora 40 hezar kesî li xwe bigire[5].

Pêkhateya demografîya kampê: Li gorî amarên herî dawîn (adara 2023) ku Navenda Firatê ya Lêkolînan ji birêveberîya kampê wergirtiye, hejmara niştecihên kampê wiha ye:

---

[3] Jêdera borî- û şopandina tîmê Navenda Firatê ya Lêkolînan li Kampa Holê di gera meydanî de- 29 adara 2023.

[4] Li gorî raporên OCHA, nifûsa di Nîsana 2019 de gihîştîye 73,393 kesan. OCHA, Komara Erebî ya Sûrîyê, Bersiva Mirovî li Kampa Holê, Rapora Rewşa Hejmar 3, Gulan 2019, r.1.

[5] Grûpên Krîzên Navnetewî, Jin û Zarok Pêşî: Derxistina Bîyanîyên Girêdayî Dewleta Islamî ji Sûrîyê, Rapora Rojhilata Navîn jimare 208, 18 Mijdar 2019, r3.

| | | | |
|---|---|---|---|
| Îraqî: | 6898 malbat | 25948 kes | Ji wan 15226 zarok |
| Sûrî: | 5015 malbat | 18204 kes | Ji wan 11808 zarok |
| Malbatên DAIŞ ên bîyanî, beşê "Muhacîrat" | 2254 malbat | 7652 kes | Ji wan 5280 zarok |

Li gorî amara navborî, hejmara kesên li kampê dimînin 51204 kes in, di nav wan de 14167 malbat, her wiha 32314 zarok in, ku temenê wan di navbera salek heta 17 salan de ne. anku bêhtirî 65% ji niştecihên kampê zarok in, û her zêde dibin. Li gorî amarên beyannameyên zarokan ên ku birêveberîya kampa Holê dan me, rêjeya navîn a jidayîkbûnên nû li kampa Holê, li beşên sûrî û îraqî 60 zarok her meh e, ev ji bilî zarokên ku bi awayekî xwezayî ji dayîk dibin û li ba birêveberîya kampê nayên qeydkirin.

Bi vê yekê eşkere dibe ku rêjeya herî mezin ji niştecihên kampa Holê, zarok in û hejmarek ji wan bi kiryarên terorîst an bi piştgirî û alîgirîya terorê tawanbar in. Li nik wê, gelek jinên DAIŞ`ê heta niha jî li gorî şêweyê jîyana xwe ya berê, ya dema desthilatdarîya "Dewleta Xîlafetê" dijîn, û heta niha serê zarokên xwe bi fikirên tundrew dadigirin, lewra êdî dîtina dîmenên tundûtûjîyê û sûcên kuştinê ji wan zarokan re normal tên[6]. Wekî tê zanîn, DAIŞ`ê gelekî zarok di milê leşkerî de bi kar tanîn, û navê "Aşbal Xîlafa" li wan dikir, û her wekî "Xwîna Nû" ya ku dê DAIŞ`ê li ser lingê wê bisekinîne û ji nû ve vejîne tên dîtin. Ji ber vê yekê, mayîna wan zarokan di jîngeheke bi vî rengî de metirsîyan li ber çavan radixin; ku DAIŞ ji nû ve vegere. Di tebaxa 2022`an de, di encama operasyona ku li kampa Holê ji hêla hêzên ewlekarîya hundirîn û bi destekdayîna Hêzên Sûrîyaya Demokratîk QSD ve encam da, derdora 33 kon hatin jihevxistin, ku ew kon weke "navendên mejîşiştin û dadgehên ji derveyî çarçoveya

[6] Di nava bangewazîyên ji bo vegerandina malbatên DAIŞ`ê yên alman ji bo welatê wan, hikûmeta alman dîyar kir ku kampa Holê ya li Bakurê Sûrîyeyê ji bo DAIŞ'ê bûye dibistaneke xeternak a terorîstan û got ku jinên rêxistinê zarokan amade dikin da ku bibin "nifşê bê" yê DAIŞê. Wê her wiha bal kişand ser asta bilind a tundrewîyê di nav zarok û xortan de, û zêdebûna tundûtûjîyê, û da zanîn ku xuya ye serkirdayetîya DAIŞê zarok û xortên kamp û zindanên penaberan wek "nifşê bê" yê rêxistinê dibîne. . DW News, Hikûmeta Alman: Kampa Holê li Sûrîyê "dibistana terorê ya xeternak e", https://cutt.us/WGQRf

dadwerîyê" li dijî niştecihên kampê dihatin bikaranîn, bi taybet kesên ku rêgez û fikirên DAIŞ`ê red dikin.[7]

Ji ber pirsgirêkên li kampa Holê, bi taybet di milê ewlekarî û birêveberî de, û di ber kêmkirina zextê ji ser kampê, Rêveberîya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê beşek ji malbatên DAIŞ`ê yên bîyanî veguheztin kampa Rojê.

## Du- Kampa Roj: Yek ji rêyên heyî yên kêmkirina metirsîyan

Ev kamp di 24.6.2015`an de li gundewarê bajarê Dêrikê ji alîyê Rêveberîya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê ve hat vekirin, ew jî bi armanca pêşewazîya penaberên îraqî û koçberên bajarê Hesekê û gundewarê wê, di dema êrîşên DAIŞ`ê û kontrolkirina rûberên berfireh ji Iraq û Sûrîyayê. Lê piştî rizgarkirina wan herêman, sûrî vegerîyan Hesekê û pirranîya îraqîyan vegerîyan Iraqê, lê beşekî berê xwe da Holê, ku bi vê yekê ev kamp di dawîya sala 2017`an de bû kampeke pêşewazîkirina malbatên DAIŞ`ê, lê tenê yên bîyanî, li nik mayîna hin malbatên îraqî û sûrî li nav kampê.[8]



Wêneyek ji hundirê kampa Roj, li gundewarê Dêrikê

Yek ji sedemên vekirina vê kampê "kêmkirina fişarên li ser kampa Holê ye, ku hejmareke mezin ji malbatên DAIŞê tê de hene, li rex hebûna

[7] Ji daxuyanîya ku di 27ê Tebaxa 2022an de li ser malpera fermî ya Hêzên Sûrîyeya Demokratîk hatiye weşandin https://sdf-press.com/?p=38176
[8] Daxuyanîyeke taybet a Hikmîya Îbrahîm, hevseroka kampa Roj, di dîroka 20`ê nîsana 2023`an de.

penaber û koçber, û zêdebûna tundrewî, tawan û hewlên revê, bi taybetî ji beşa "jinên Muhacîrat."[9]

Li gorî dane û amarên dawîn ên li kampa Roj ku ji alîyê hevserokatîya rêveberîya kampê ve hatin pêşkêşkirin, di kampê de 707 malbatên bîyanî yên ji 60 neteweyan hene, anku ji 2 hezar û 602 kesî pêk tê, di nav wan de 1530 zarok in, ev ji bilî hebûna 11 malbatên sûrî û 69 malbatên penaberên Îraqî jî.

**Sîstema li kmapê**

Sîstema li vê kampê ji ya ku li kampa Holê û tevaya kampên li Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê heye gelekî cuda ye, çimkî ev kamp taybet ji bo malbatên DAIŞ`ê yên bîyanî "ji jinên Muhacîrat û zarokên wan" re hatiye veqetandin". Ji mercên bingehîn ên li vê kampê hatiye ferzkirin, "nabe jin cilûbergên reş li xwe bikin", lê dîsan jî nigibandina ji serî heta binî ne qedexe ye.[10]

Armanc ji mercê navborî, ku li ser kesên dixwazin ji kampa Holê derkevin û berê xwe bidin ya Roj "Rehabîlîtasyonkirina wan jin û zarokan, û bidûrxsitina wan ji fikirên radîkal û tundrew e", li gorî hevseroka birêvberîya kampê.[11]

**Xezmetên bêhtir, û bendên kêm**

Di berdêla danîna hin mercan li ser wan, rêveberîya "Kampa Roj" xizmetên zêdetir pêşkêşî niştecihên vê kampê dike. Di biwarê xizmetguzarîyê de, "konên li kampa Roj rasterast li ser erdê nayên vedan, mîna kampa Holê, lê li ser bingeheke betonî hatine çêkirin, û dîwarên bi qasî metreyekî bilind li derdora wan hatine çêkirin, ew jî ji bo hêsanîya paqijkirin û tevgerê û parastina wan ji şert û mercên hewayê û herikîna avê, ev yek li rex dabînkirina elektrîkê ji bo hemû çadiran".[12]

**Ofîsa veguheztin û pevguherîna pereyan**

Li bazara kampê ofîseke taybet ji bo veguhestina pereyan heye, ku di bin çavdêrîyeke asê ji alîyê rêveberîya kampê de bi hevahengîya li gel

[9] Jêdera borî.
[10] Jêdera borî.
[11] Daxuyanîya birêveberîya kampa Roj a taybet bo navenda Firatê ya lêkolînan 20`ê nîsana 2023`an.
[12] Gera meydanî ya tîmê navenda Firatê li nav kampa Roj 20`ê nîsana 2023`an.

dezgehên ewlekarî û Odeya Operasyonên Hevpeymanîya Navdewletî[13] de ye. Li gorî rêkarên ku li wê ofîsê hene, gerek e malbata ku ne zêdetirî 3 kesan be, ji bilî 300 dolarê amerîkî her meh wernegire. Lê eger malbat zêdetirî 3 kesan be, dikare mehane 500 dolarî werbigire. Ev mercên han jî da ku ev malbat pereyan kom nekin û ji bo revîna[14] ji kampê bi kar neyînîn. Helbet ev miqdara han ji pereyan, li ser asta jîyanî ya li Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê gelek e, nemaze ku malbatên DAIŞ`ê li kmapan bi awayekî dorveger selikên xwarinê û guhdana tenduristîtî ji alîyê rêxistinên navdewletî yên li kampên Roj û Holê bi dest dixin.



Jinên DAIŞ`ê li kampa Roj li ber ofîsekê sekinî ne da ku pereyên ji wan re hatî werbigirn

Bi vê yekê êdî jinên li kampan pereyên ku malbatên wan ji wan re şandine werdigirin, her wiha ji bo yên ku kesekî wan tune ye ku pere ji wan re bişîne jî, rêveberîya kampê bi piştgirîya hin rêxistinan pêdivîyên wan ên herî girîng dabîn dike, li rex vekirina bazarek biçûk di kampê de ji bo kirîna kelûpelên xwe.[15]

Bê guman, veguheztina hejmarek ji malbatên DAIŞ`ê bo kampa Roj, hindekî fişarên li ser kampa Holê kêm kirin, hem ji hêla ewlekarî ve û hem jî ya birêveberî ve. Li alîyekî din, dikarîbû rêjeya sûcan li kêmê bixe û malbatên DAIŞ`ê û bîyanî ji hêla ewlekarî ve werin kontrolkirin, bi

[13] Rojnameya El-Şerq El-Ewset di nûçeyeke xwe de bi sernavê "Jinên DAIŞ'ê" li kampa Roj di bin çavdêrîyeke tund de...û li benda vegera bo welatên xwe https://aawsat.com/home/article/3145266/ serdana dawîn Hezîranê 13, 2023.
[14] Çavkanîyeke taybet ji birêveberîya kampa Holê 20`ê nîsana 2023.
[15] Daxuyanîya hevserokatîya kampa Roj ji navenda Firatê ya lêkolînan 20`ê nîsana 2023`an.

gotineke din, kampa Roj êdî bûye nimûneya çareserîya demkî ya kêmkirina xeterîya malbatên DAIŞ`ê û zarokên wan, lê dîsan jî hîna hin xalên lawaz li wê kampê peyda dibin ku DAIŞ û şaneyên wê yên veşartî, bi kar tinîn û stratejîya xwe ya avakirina "artêşeke nû ji zarokên DAIŞ`ê" dimeşîne. Ji van xalên em behsa wan dikin, wekî mînak, tevlihevî û danûstandinên di navbera zarokên DAIŞ`ê û zarokên penaberên îraqî û koçberên sûrî li kampê de, çi li nava dibistanan û çi jî li nava bazara kampê. Her wiha, hêsanbûna danîna têkilîyan bi cîhana li derve re bi rêya telefonên xwedî internet, ku di operasyonên ewlekarîyê yên paqjikirinê li hûndirê kampê gelek telefon hatin desteserkirin, ev yek ji bilî bikaranîna înertnetê û medîyaya civakî bi awayekî azad. Hêjayî bibîrxistinê ye ku DAIŞ`ê di belavkirina fikirê xwe yê radîkal gelekî xwe spartîye înternetê û navgînên ragihandinê yên modern.

Tevî tişta me li jor gotî, xaleke din a hevbeş di navbera kampa Hol û Roj de peyda dibe ew jî tevlîhevbûna di navbera malbatên DAIŞ`ê û koçberên sûrî û penaberên îraqî de.

**Sê- Karekterê awarte yê kampên Roj û Holê**

Wek tê zanîn, kamp ji bo sivîlên koçber û penaberên welatên cîran tên avakirin. Ew sivîlên ku ji ber sedemên şer û bobelatan, an jî ji ber sedemek din ku li ser jîyana wan gefek e, neçar dibin ku cih û warê xwe biterikînin, îcarê guhdana bi wan sivîlan ji ber mijareke mirovî ye, dikeve ser milê hikûmet û welatên mazûvanê kmapan, an jî yên ku li ser erda wan ew kamp hatine avakirin, û li gorî qanûnên navdewletî yên girêdayî koçber û penaberan. Lê rewşa kampên Roj û Holê, rewşeke ewarte û kêmpeyda ye li cîhanê, çimkî niştecihên van herdu kampan hem koçberên sûrî ne û hem jî penaberên îraqî ne, ku ji ber sûcên DAIŞ`ê û komên din ên çekdar revîyan, lê di heman demê de li nava herdu kampên navborî malbatên DAIŞ`ê ji jin û zarok jî hene, anku di heman cihî de hem kujer dimîne û hem jî qurbanê wî kujerî.

Ji hêla qanûnî ve jî, her kategorîyek li kampê ji kategorîya din cudatir e, îcarê ev yek rengekî taybet dide kampê û dihêle ku xwedî karekterkî ewarte û taybet be. Eger em bên behsa beşê taybet bi koçberên sûrî û penaberên îraqî bikin, em dê bibînin ku vî beşî taybetmendîya xwe ya sivîl û mirovî parastîye, çimkî ev kamp ji bo wan hatibûn avakirin, lê ji

ber ku binavkirina koçber[16] û penaber[17] li malbatên DAIŞ`ê nayê kirin û ne guncaw e, êdî mirov bi ti awayî nikare wê wesfa qanûnî bi ser beşê van malbatan ve jî bike (malbatên DAIŞ`ê), û li şûna wê wesfê, tenê wesfa "Girtîgehên demkî" ji beşên wan malbatan re digunce, ji ber ku malbatên DAIŞ`ê ne bi îradeya xwe, xwe li van kampan girtine, lê belê bi darê zorê, piştî têkçûna qaşo "dewleta" wan.

Ev karekterê taybet ê kampên Hol û Roj, û ev tevlinavhevbûna koçber û penaberan ji alîyekî ve, û malbatên DAIŞ`ê ji alîyekî din ve hiştin ku gelek pirsgirêkên ewlekarî û qanûnî encam bidin. Ji dema ku ev malbat gihîştine kampa Holê, gelek kesên ku girêdaneke wan a yekser bi DAIŞ`ê re hebû bela xwe di sivîlên sûrî û îraqî didin, û asta vê tundrewîyê gihîşte pileyeke bilind, nemaze ji hêla jinên bîyanî yên radîkal "Muhacîrat". Lê tevî wê jî, heta niha danûstandina li gel van kampan mîna danûstandina bi kampên din ên li tevaya cîhanê re ye, guhdan û parastin ji hemû alîyan ve ji wan re tê pêşkêşkirin, çi ji alîyê Rêveberîya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê ve, çi jî ji alîyê Rêxistinên civaka sivîl û rêxistinên navdewletî bi armanceke mirovî. Di van kampan de çi pêdivîyên ku li kampên koçber û penaberan li tevaya cîhanê tên pêşkêşkirin, ji wan re jî tên dabînkirin, bêyî ku heta niha, ti hewldaneke herêmî yan jî navdewletî ji bo vekirina lêpirsînekê derheqê wan jinên ku bi îradeya xwe û bi bawerî tevlî "xîlafeta DAIŞ`ê" bûne bê vekirin. Lê xala xeterîyê ew e ku ev jinên han nifşekî nû yê ku ji fikirê DAIŞ`ê şîr vexwarine, bi xwedî dikin, û wan weke artêşeke nû ya DAIŞ`ê mezin dikin. Ev prose jî ji kampan dest pê dike û li ser destê jinên DAIŞ`ê yên ku erka parastina nislê DAIŞ`ê dane ser milê xwe, piştî têkçûna dawîn ji hêla erdnîgarî û leşkerî ve.

Ji bo rêgirtina li ber van metirsî û xeterîyan, an jî kêmkirina wan, Rêveberîya Xweser hewl da ku çareserîne demkî ji wan re bibînin, her wekî avakirina navendên rehabîlîtasyon û guhdana bi zarokên DAIŞ`ê.

---

[16] Li gorî prensîpên girêdayî koçberîya navxwe, ku çarçoveyek ji hêmanên parastina koçberan û mafên wan re danîn, koçber wisa pênase kir: Kes an komek kesên ku bi taybetî ji ber pevçûnên çekdarî, rewşên tundûtûjîya giştî, binpêkirina mafên mirovan, an karesatên xwezayî an ji hêla mirovî ve, neçar bûne ku birevin an ji mal û cihên rûniştina xwe derkevin, û ji bo ku ji bandora van rewşan dûr bikevin, lê van kesan sînorên navneteweyî yên naskirî yên dewletê derbas nekirine.

[17] Li gorî madeya 1`ê ji rêkeftina taybet bi penaberan a sala 1951`ê; penaber ew kesê di encama bûyereke ku berîya destpêka çileyê 1951`ê heye, û gelek sedemên metirsîya wî hene, her wekî rasthatina çewsandinê bi sedemine olî, neteweyî, nijadî û alîgirîya hin komên civakî yanî nêrînên sîyasî, ev kes bûye li derveyî welatê xwe, û her wiha ji ber sedmên me gotî, naxwaze vegere cih û warê xwe.

**Mijara Duyem: Zarokên DAIŞ`ê li navendên rehabîlîtasyon û guhdanê**

Rêxistina DAIŞ`ê ya terorîst cureyekî din ji qurbanîyan li pey xwe hişt, ku ew jî zarok in. Êdî DAIŞ`ê hewl da ku wan bi kar bîne û di ber armancên xwe de wan tecnîd bike. Bi vê yekê, pirsgirêkeke bingehîn derkete holê, ew jî ev e; gelo çawa rê li ber van xeterîyan dikare were girtin? her wiha gelo ew zarok çawa dikarin tevlî civakên xwe bibin? Çimkî ne dûr e ku nifşekî nû ji kesên radîkal ku li ser "nehcê" bavên xwe bimeşin derkeve, ew zarokên ku fikirê bavê xwe yê radîkal bi rêya dayîka xwe fêr dibe û werdigire, her wiha mejîyê wan tê şûştin, eger bernamene rehabîlîtasyonê yên guncaw neyên dayîn. Bi taybet ku ev zarokên han demeke dirêj di himêbêza "dewleta Xîlafetê" de bi xwedî û mezin bûne, ew dewleta ku xewna mayîn û berdewamîya xwe di serê wan zarokan de çand, mejîyê wan bi fikirê xwe şûşt, ku di encamê de çi kesê bi "xîlafeta wan" ne bawer be weke kafir bê dîtin û di ber pêkanîna armancên xwe de kiryarîyên terorsît pêk bînin.




Wêneyê arma navenda Hûrî ya zarokên DAIŞê li gundewarê Qamişloyê

Di encamê de, Rêveberîya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê hin navendên rehabîlîtasyona zarokên DAIŞ`ê ava kirin, da ku ji keysbazî, îstîsmar û tundrewîyê bên parastin, her wiha stratejîya DAIŞ`ê ya amadekirina artêşeke paşerojî were têkbirin. Di van navendan de prosesa jinûve-bixwedîkirina bi sedan ji zarokên DAIŞ`ê, yên ku berê bi navê

"Eşbal El-Xîlafa" dihatin nasîn, û pirranîya wan bîyanî bûn, li nik hinekên sûrî û îraqî, bi rê ve diçe.

**Yek- Navendên "Hûrî" û "Orkêş"**

"Navenda Hûrî ji bo Parastin û Perwerdeya Zarokan" di adara 2017an de, li derdora bajarokê "Tal Maaruf"ê, li bajarê Qamişloyê, li bakur rojhilatê Sûrîyayê hate damezrandin. Avahîya wê yekqatî ye û bi dehan odeyên ji bilî hewşek fireh hatiye lêkirin. Navend nêzîkî 160 zarokên ji neteweyên cihê dihewîne, di nav wan de hin zarokên sûrî û îraqî yên ku bi navê "Eşbalên xîlafetê" dihat nasîn, hene.



Wêneyê hewşa navenda Hûrî

Lê Navenda Orkêş, ku di îlona 2022`an, li gundewarê bajarê Qamişloyê hat vekirin, ji avahîyeke sereke ya duqat pêk tê, di vê avahîyê de holên dersdanê, odeyên xewê, holên lîstikê û odeyeke destwerdana lezgîn a tenduristî hene. Her wiha li kêleka avahîyê, odeyên xwarinê û saloneke berberîyê hene. Di vê navendê de, 87 zarokên ku pirranîya wan bîyanî ne û temenê wan di navbera 13-18 salî de ne, hene. Ev navend dikare heta 150 zarokî bihewîne.



Avahîya navenda Orkêş a rehabîlîtasyona zarokên DAIŞ`ê

Ev herdu navendên navborî, taybet ji bo rehabîlîtasyona zarokên DAIŞ`ê yên ku sûc û kiryarîyên tundrew di nava rêxistinê de kirine ne. Zarok li navendê bernameyên rehabîlîtasyonê li gorî zanînên xwecihî dibînin, ku Rêveberîya Xweser dabîn kirine.

Di van herdu navendan de, zarokên ji 20 neteweyên cuda hene (Ereb, Ewropî, Amerîkî, Afrîkayî û Asyayî), û piranîya wan perwerdeyên leşkerî û şer`î li cem DAIŞ`ê dîtine, ew jî dema ku "Eşbal Xîlafa" bûn, ku gelek ji wan di dîmenên tundrew de yên medyayên dîtbar ên DAIŞ`ê de hatibûn xuyakirin, ev zarokên han di dema şerê li ser erdê hatibûn girtin an jî dema hewl dan ku li gel malbatên xwe ji Sûrîyayê birevin, bi taybet di dema êrîşên Tirkîyayê li dijî Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê.[18]

Li nik wê, hin ji wan zarokan, ku temenê wan 12 salî ne, ji kampên Hol û Roj bo van navendan hatin veguheztin, ew jî bi armanca ku keysbazîya zayendî ya ji hêla jinên DAIŞ`ê ve bên parastin.

## Bernameya rojane

Li gorî bernameya rojane ya herdu navendan, zarok saet 6ê sibehê ji xew radibin, werzîşê dikin û piştre saet 7an taştê dixwin, piştre dersên rehabîlîtasyonê ji alîyê pisporên di biwarê şêwirmendîya derûnî de dest

[18] Daxuyanîyek taybet ji Navenda Firatê ya Lêkolînan re, ji alîyê hevserokê Nivîsgeha Karûbarên Dad û Çaksazîyê, Xalid Ramo, ve di 5ê nîsana 2023an de.

pê dikin. Zarok di dewreyên komî û ferdî de kursên perwerdehîyê derbas dikin, ku tê de teknîka "Xwevalakirina hestyarî" bi sepandina ceribandinên psîkolojîk ên ku dibin sedema xwenaskirinê[19] tê bikaranîn. Armanc ew e ku zarokan ji nû ve bên bixwedîkirin û ew bikarin jîyaneke asayî ya zarokatîyê dûrî çek, tundî û îdyolojîya tundrew bijîn.

Waneyên ku xwe dispêrin metiryalên tevlîhevkirî, yên UNICEF û Rêveberîya Xweser, berdewam dikin û zarokên DAIŞ`ê li herdu navendan waneyên cihêreng di exlaq, wêje, zanist, dîrok û cografîyayê de dibînin. Anku ew di proseyeke perwerdehîyê ya dibistanî û hevgirtî re derbas dibin, û li gorî astên xwe li ser ketegorîyan tên dabeşandin ji lawaz, baş û pirbaş. Her wiha hin hene ku ti carî nexwendine, lewa waneyên xwendin û nivîsandinê dibînin.[20]



Zarokên DAIŞ`ê li navenda Orkêşê bi "Bîbî Fûtê" dilîzin


Li rex wê yekê, ew zarok fêrî zimanên erebî û îngilîzî jî dibin. Bi vê yekê heta saet 1 û nîvê nîvroyê ders berdewam dikin, paşê firavînê dixwin, û piştre dest bi çalakîyên xwe li holên taybet dikin, ku ew hol xwedî televîzyon, mektebeyeke piçûk, lîstokên Bilyardo û "Bîbî Fût", dam û hwd in, ev li rex lîstina bi goga lingan û ya paskitboolê, û lidarxistina çalakîyên çêkirina tişan li ser destan, nîgarkêşî û mûzîk. [21]

[19] Daxuyanîyek taybet ji bo Navenda Firatê ya Lêkolînan, ji hêla rêveberên Navenda Orkeş ve di 10 gulan 2023 de.
[20] Çavkanîya navborî.
[21] Li gorî gera meydanî ya tîmê navenda Firatê li nav navneda Orkêşê, di 10`ê gulana 2023`an de.

## Sîstema li herdu navendan

Navenda Hûrî di milê çaksazkirina zarokên DAIŞ`ê yên ku beşdarî şerên trorîst bûn an jî perwerdeyên "şer`î" yên DAIŞ`ê dîtine pewiryeke giran daye ser milê xwe. Li navenda Orkêşê bi pirranîya xwe zarokên DAIŞ`ê yên ku vê dawîyê ji kampên Hol û Roj derketine, ew jî piştî ku temenekî destnîşankirî temam kirine.

Birêveberîya navendê zarokên li cem xwe di nava girûpên birêxistinkirî de dabeş kirine, bi rêya sazkirina encûmenên taybet bi wan, û dabeşandina karûbarên pêwîst, ên girêdayî paqijî û xizmetên li hundirê navendê li nav wan zarokan bixwe. Her wiha amadekirina wan zarokan bixwe ji xwarina xwe re.




Wêneyê xişteya biparvekirina karên paqijîyê ji alîyê zarokên DAIŞ`ê li navenda Orkêşê

## Danîna pêwendîyan li gel cîhana derve

Di demekê de ku zarokên herdu navendan telefonên destan û Înternetê bikar naynin, xizmetguzarîyê ji wan re peyda dike ku bi malbatên xwe re, çi li kampa Holê û çi li kampa Roj, her du heftîyan carekê, bi rêya telefonê, yan bi rêya posta ku ji alîyê Xaça Sor a Navdewletî ve ji wan re tê şandin, pêwendîyan dideynin. Her wiha rê didin dayikan ku her demekê, biçin serdana zarokên xwe li navendan bikin, bi hemahengîya di navbera rêveberîya navend û kampan de têne destnîşankirin, li gorî ku birêveberên her du navendan piştrast kirine, û dîyar kirin ku “navenda

wan ne girtîgeh e” û zarok piranîya dema xwe li derveyî odeyan û li hewşê derbas dikin û dersan distînin.

## Asta biserketina rehabîlîtasyona zarokan?

Çavdêrên bernameya rehabîlîtasyonê li herdu navendan dibêjin ku zarok dikarin di warê bersivdayînê de bibin du beş: beşa yekem bi lez bertek nîşan da û reftar û ramanên xwe guherand, ji ber ku navend ji bo guhertina ramanên zarokan, perwerdekirina wan li ser dijîtîya şerkirin û tundrewîyê û hezkirina malbat û xelkê dixebite, û zarok di destpêkê de ji danûstandina bi mamosteyên xwe re, bi taybetî mamosteyên jin, bi dûr dikevin, lê piştre reftarên wan ber bi asayîbûnê ve diçe û dest bi danûstandina bi mamoste, perwerdekar û hevalên xwe re dikin.[22]

Di derbarê beşê duyemîn de, ev beş îdia dike ku xwe diguherîne û li gorî çavdêrên her du navendan, "hinek ji wan îdia dikin ku reftarên xwe diguherînin, û em vê yekê bi rêya çavdêrên derûnî yên ku her hefte bi wan re dicivin dizanin, wekî ku tê dîtin ku ew hîn jî bi awayekî nepenî îdeolojîya rêxistinê diparêzin." Wan tekez kir ku bi lêkolînkirina rewşa civakî, malbatî û aborî ya ku ev zarok tê de dijîn, "eşkere bû ku piranîya wan êşa ji ber xizanî û nebûna xwendinê dikêşan, lewra îdyolojîya wan ne kûr e û dikare were sererastkirin."[23]

Di derbarê pirsa me ya girêdayî bicihanîna armancên navendê de, birêveberan got: "Hîn zû ye [24]em behsa biserketina navendê bikin, lê encamên erênî hene, û heta niha em rastî ti pirsgirêkeke mezin bi zarokan re nehatine, bi rastî jî ev zarok tên guhertin, û gelek ji wan jixwebere tên bi me re didin û distînin, ev jî nîşaneya dawîanîna li fikirê radîkal yê girtî ye, gelek ji zarokan niha guhdarî mûzîkê dikin, di wextekî de ku berê ev mûzîk heram didîtin".

## Çarenûsa zarokan piştî ku 18 sal temam kirin?

Li gorî birêveberên navendên rehabîlîtasyonê, piştî ku zarok qonaxa xwe ya rehabîlîtasyonê bi dawî dikin, û piştî ku digihin temenê 18 salî, eger sûrî yan îraqî bin; bo malbatên wan tên vegerandin, ev yek piştî ku li dadgehên Rêveberîya Xweser ên taybet bi ciwanan vegerin, lê dîsan jî

[22] Daxuyanîyeke taybet a serperiştên bernameya rehabîlîtasyonê li navendên guhdanê ji Navenda Firatê re, 25`ê gulana 2023`an.
[23] Çavkanîya navborî.
[24] Çavkanîya navborî.

derfet li pêşîya birêveberîya navendan di milê destnîşankirina dema rehabîlîtasyonê, derxistina zarokên sûrî, û vegerandina wan bo malbatên wan de vekirî ye, lê gerek e raporek ji Rêveberîya Xweser re bê pêşkêşkirin.

Lê di derbarê zarokên bîyanî de, hemahingî di navbera Rêveberîya Xweser û welatên wan zarokan de çêdibe, îcarê eger welatên wan wergirtina wan pejirand, ew ji bo nûnerên wan welatan tên radestkirin, eger na, çi zarokê ku temenê wî 18 sal derbas kiribe, li navendên destbiserkirinê yên taybet tên hiştin; heta ku çareserîyek ji wan re bê dîtin[25].

**Du- Navenda Hilatê ya guhdan û rehabîlîtasyona zarokan**

Ev navend di 25ê cotmeha 2021an de li bajarê Hesekê bi awayekî fermî, li ser pêşnîyar û projeyeke ku ji alîyê Yekîneyên Parastina Jin (YPJ) ve hat pêşkêşkirin û bi hevkarîya Hevpeymanîya Navdewletî ya şerê li dijî DAIŞê, hat vekirin. Desteya Jinê li Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê serperiştîya vê navendê dike. Navend ji 5 odeyên berê çêkirî pêk tê, û ew ode hem ji bo lîstinê û hem jî ji bo fêrkirinê, ji zarokan re tên bikaranîn, her wiha li nîva vê navendê, qadeke fireh a lîstinê jî heye.[26]




Arma navenda Hilatê ya rehabîlîtasyon û guhdana bi zarokan li bajarê Hesekê

[25] Daxuyanîyeke taybet ji alîyê hevserokê giştî yê ofîsa dad û çaksazkirinê, Xalid Remo, bi navenda Firatê, 5`ê nîsana 2023`an.
[26] DAxuyanîya birêveberîya navenda Hilatê ji navenda FIratê re, di 25`ê gulana 2023`an.

Ji hêla taybetmendî û mercan ve, ev navend gelekî ji navendên Hûrî û Orkêşê cudatir e, çimkî Hilat zarokên temenê wan di navbera 3-13 salan de pêşwazî dike, û ev zarok ên dayikên ku sûc kirine û cezayê zindanê xwarinê ne, lê hukimê her dayîkekê ji hêla demê ve ji ya din cudatir e, lewra armanc ji vê navendê ew e ku ev zarok di dirêjahîya hukimê dayîka xwe de li gel wê, di zindanê de nemînin. Li gorî sîstema li navendê, zarok ji saet 8`ê sibehê heta 2`ê piştî nîvroyê li navendê dimînin, paşê bo dayîkên wan ên li zindanan tên vegerandin. Ev prose jî li gorî bendê 9`an ji rêkeftina Cinêvê ya Mafên Zarokan e, ku dibêje gerek e zarok ji malbatên xwe neyên bidûrxistin. Di encamê de, ev navend heta ku dayîkên zarokan hukimê xwe bi dawî bikin, guh dide zarokên wan, ji ber ku rewşa wan dayîkan li zindanê ne ya guhdana bi zarokan e, û navenda Hilatê vî erkî digire ser milê xwe.[27] Bê guman ev yeka han li gorî qanûna jimar 7 a sala 2022`an a ku ji hêla Meclisa Giştî ya Rêveberîya Xweser ve derketî, bi navê "Guhdana Alternatîf" tê zanîn. Li gorî madeya 31`ê ji vê qanûnê: "armanca pergala guhdana alternatîf dabînkirina guhdana civakî, derûnî, tenduristî û pîşeyî ji zarokên ku derfet bi destê wan neket di nava malbatên xwe de bijîn. Armanc her ew e ku bi awayekî saxlem mezin bibin, û hezkirin û dilovanîyan ku jê mehrûm bûne qerebû bikin…"[28]

Li gorî temenê zarokan, li ser 3 beşan hatine dabeşandin:

• Beşê yekem ji 3 heta 6 salî.

• Beşê duyem ji 7 heta 9 salî.

• Beşê sêyem ji 10 heta 13 salî.

Li gorî bernameya navendê ku bi awayekî hevbeş ji alîyê Desteya Jinê û rêxistina *Save the Children* ve hatiye amadekirin, zarok waneyên perwerdeyê yên wekî erebî, îngilîzî, matematîk û zanistî werdigirin, ji bilî çalakîyên bêhnvedanê yên hundirîn ên wekî xêzkirin û muzîkê, û çalakîyên li derve wek lîstikên cihêreng. Li rex vê yekê, navend guhdana tenduristî û xwarinî ji zarokan re pêşkêş dike, û "Save The Childern" kelûpelên lojistîk pêşkêş dike.

---

[27] DAxuyanîya birêveberîya navenda Hilatê ji navenda FIratê re, di 25`ê gulana 2023`an.

[28] her wiha, qanûna hekûmeta şamê jî rêgeza guhdana alternatîf a ji bo zarokên dêûbavên wan nenas dide pêş, ew jî li gorî biryarnameya girêdayî karûbarên zarokên têkildar û guhdana bi wan. http://www.pministry.gov.sy/contents/24336/.



Wêneyên ku zarokên DAIŞ`ê (keç) li navenda Hilatê xêz kirine, di wan de rêûresmên rûyan xêz nekirine ji ber ku "heram" dibînin.

Dema ku cezayê li ser dayikan hatiye birîn bi dawî dibe, zarok bi dayikên xwe re vedigerin kampan, îcarê ji ber vê yekê dema mayîna zarokê li navendê bi dema cezayê dayikê li girtîgehê ve girêdayî ye. Hejmara zarokan li navendê di navbera 50 heta 100 zarokan de ye û li gorî ketin û derketina jinên DAIŞ'ê ji zindanan zêde û kêm dibe.[29]

Lê, her çiqasî gava Rêveberîya Xweser ji bo nehiştina metirsîyên zarokên DAIŞê, bi vekirina navendên rehabîlîtasyon û çaksazîyê, bi derfetine xweser û xwecih, erênî bê dîtin, û dikarîbû heta radeyekê xeterîyên wan zarokan bi rêya bidûrxistina wan ji fikirê tundrew û radîkal an jî îstîsmarkirina wan ji alîyê DAIŞê û şaneyên wê yên veşartî li nav kampan ve. Lê ev hewldan ji ber çend sedeman têrê nakin, ev sedemên herî girîng ev in:

- Hejimara mezin a zarokan (34091) li kampên Roj û Holê, û têrênekirina van navendan ji bo bixwedîkirina wan.
- Kêmhebûna pisporîyên xwecihî yên amadekirina bernameyên rehabîlîtasyon û çaksazîyê.
- Kêmderfetîya darayî ya Rêveberîya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê, ji ber ku avakirina navend û amadekirina bernameyên

[29] Çavkanîya navborî.

rehabîlîtasyonê ji vêqas hejmarê re pêwîstîya xwe bi xebatên gelek alîyên herêmî û navdewletî heye.

## Beşê Duyem

## Metirsî û kêşeyên zarokên DAIŞ`ê

Piştî têkçûna erdnîgarî ya DAIŞê û veguhestina bi hezaran ji malbatên wê bo kampan, gelek metirsî û kêşeyên van malbatan bi giştî û zarokan bi taybetî derketin. Gelek faktor li pişt van metirsî û pirsgirêkan in, ku hinek ji wan ji ber hebûna van zarokan li jîngeheke ji bo mezinkirina wan ne guncaw in, û yên din jî girêdayî xweperpirs-nedîtina civaka navdewletî di derbarê peydakirina çareserîyeke baş ji girêka "mîrata rêxistina DAIŞ`ê" re. Em ê li vir xeterî û kêşeyên herî berbiçav bikolin.

### Mijara yekem: Xeterîyên zarokên DAIŞ`ê

Mayîna zarokan li kampên penaberî û koçberîyê xeterîya wan zêdetir dike, çi li ser zarokan bixwe, û çi jî li ser hawirdora wan û tevaya civakê. Her wiha, dîtina van zarokan ji bernameyên rehabîlîtasyon û çaksazkirinê li navendên taybet jî, nayê wateya ku rê li ber van xeterîyan tê girtin. Niha em binêrin bê ev xeterîyên em behsa wan dikin ku girêdayî dosyaya zarokên DAIŞ`ê li Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê çi ne?

### Yek- derengîya vegerandina zarokan bo welatên wan

Rêveberîya Xweser gelek caran bang li  welatên pêwendîdar kir ku welatîyên xwe vegerînin, di nav wan de malbat û zarokên DAIŞê yên li kamp û navendên rehabîlîtasyonê. Hin welatan bersiva van bangan dan û hejmarek ji welatîyên xwe wergirtin. Li gorî daneyên ku Navenda Firatê ya lêkolînan ji gerînendeya Têkilîyên Derve ya Rêveberîya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûrîyeyê wergirtin; di navbera salên 2019 û 2023'an[30] de, hejmara zarokên bîyanî yên ku bi fermî radestî hikûmetên welatên wan hatine kirin tenê (1300) zarok in, di demekê de ku zêdetirî 5,500 zarokên bîyanî hîn li kamp û navendên rehabîlîtasyonê ne û li benda vegera bo welatên xwe ne.

Ji van daneyan dîyar dibe ku hejmara kesên vegerîyane li gorî hejmara zarokên bîyanî yên li kamp û navendên rehabîlîtasyonê li Bakur û

[30] Qefleya herî dawîn di 22`ê gulana 2023`an bo welatê wan hat radestkirin, ew jî dema Gerînendeya Têkilîyên Derve ya Rêveberîya Xweser 108 kes ji malbatên DAIŞ`ê, ku 80 ji wan zarok bûn, radestî hikûmeta Tacikistanê kirin.

Rojhilatê Sûrîyayê gelekî kêm e. Eger radestkirin û vegerandin bi vî meqamî bidome (1300 zarok di 5 salan de), dê vegerandina ewqas zarok (5500 zarok) zêdetirî 15 salan bixwe. Ev yek wek pirsgirêkeke mezin tê dîtin, ji ber ku ev zarokên bîyanî mezin dibin, û ji ber vê yekê ew dê hemû zarokatîya xwe li kampên mişt îdyolojîya tundrew û tawankar derbas bikin, ku metirsîyên wan girantir dike û zehmetîyên rehabîlîtasyonê û tevlîkirina wan di nav civakên wan ên resen de zêdetir dike.

Lê ya ji vê yekê xetertir ew e ku piştî bi hezaran ji van zarokên bîyanî gihîştin temenê 18 salî, dibe ku welatên wan vê carê nema wan vegerîne, ji ber têgihaştî bûne, û dibe ew bixwe di wî temenî de ji tirsa dadgehkirin û cezakirinê venegerin welatê xwe, çimkî wê çaxê, ev kes dibin xwedî îrade. Ji ber vê yekê dibe ku ev zarok jî mîna dê û bavên xwe, çekdarên berê yên DAIŞê, di girtîgehan de bimînin. Di vê rewşê de, dibe ku pêwîstî bi avakirina girtîgehên nû çêbibe, û ev yek dê bibe kêşe ji bo Rêveberîya Xweser û Hêzên Sûrîyaya Demokratîk, ji ber ku ji niha ve QSD êşa dabînkirina girtîgehên li gor standardên navdewletî ji zêdetirî 10 hezar girtîyên berê yên çekdarên DAIŞê re dikêşe.

Li alîyekî din, xistina zarokan di nava bavên wan de, di heman girtîgehê de, dikare ji DAIŞ`ê re bibe derfeteke guncaw ku dîsan xwe komîserhev bike, û paşê nifşekî nû li zindanan bide avakirin, nemaze ku berê hewldanên revîna DAIŞ`ê ji girtîgehan çêbûne, her wiha tişta ku her tim ji revîna DAIŞ`ê re dibe destek, berdewamîya gefên Tirkîyayê li dijî Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê, û me dît çawa di êrîşên xwe yên vê dawîyê de, Tirkîyayê derdora hin girtîgeh û kampên ku DAIŞ û malbatên xwe li wan dimînin, armanc girt.

**Du- Zêdebûna rêjeya jidayîkbûnan**

Li gorî xişteya daneyên jidayikbûnê yên nû, li beşên kampa Holê, ku Navenda Firatê ya Lêkolînan nimûneyek jê wergirtîye, zêdebûneke berbiçav di rêjeya jidayikbûnê de dixuye. Eger em werin li serjimarîyên jidayikbûnê yên "beşî yekem", ku sûrî û îraqî lê dimînin binerin, em dê bibînin ku rêjeya jidayikbûnê ya li cem rêveberîya kampê di salên 2021 û 2022an de hatiye tomarkirin ji 110 heta 130 jidayikbûnê di salê de ye.

| Kampa Holê | 2018 | 2019 | 2020 | 2021 | 2022 | 2023 | Hejmar bi giştî |
|---|---|---|---|---|---|---|---|
| Jidayikbûna xwezayî | 272 | 318 | 69 | 110 | 130 | 24 | 923 |
| Jidayikbûna qeyserî | 22 | 0 | 0 | 0 | 0 | 0 | 22 |
| Hejmar bi giştî | 294 | 318 | 69 | 110 | 130 | 24 | 945 |

Xişteya beyanameya jidayikbûnan li beşê 1`ê li kampa Holê (2018- nîva 2023)

(ev xişte li gorî birêveberîya kampê ye)

Eger em werin van daneyan li ser 4 beşên din ên sûrî û îraqî bipîvin, wê rêjeya jidayikbûnê di pênc beşên kampa Holê de di navbera 550 û 650 jidayikbûnên nû di salê de be. Ev ji bilî zayinên xwezayî yên ku li cem rêveberîya kampê nehatine tomarkirin, ku di heman beşên "koçberên sûrî û penaberên îraqî"[31] de çêdibin, her wiha jidayikbûnên ku di beşê "jinên muhacir" de bi awayekî veşartî çîdibin.

Di encamê de, kampa Holê bi vî rengê xwe êdî dibe jîngeheke guncaw a zêdebûna nislê DAIŞ`ê û derketina nifşekî nû ku di nava hawirdoreke xeternak, radîkal û tijî sûc de çavên xwe vekirine. Her wiha, eger ewqasî dîtina çareserîyekê ji kmapa Holê re dirêj kir, dê ewqasî xeterîya vî nifşê han li ser civakên herêmê û tevaya cîhanê zêdetir bibe, çimkî ev nifş dê ji bo tevlîbûna li nava rêxistin û komkikên terorîst û micirim her di amadebaşîyê de be.

**Sê- Bikaranîna zarokan a zayendî**

Gelek raportên çapemenîyê behsa bikaranîna jinên DAIŞ`ê, li beşê "Muhacîrat", ji zarokên gihayî ( temenê wan di navbera 12-17 salan de ye) di milê zayendî de dikin, ew jî bi rêya neçarkirina wan zarokan li ser zewaca bi hejmarek ji jinên DAIŞ`ê re, bi armanca xwezêdekirinê anku zêdekirina nislê DAIŞ`ê, ku weke "parçeyek ji stratejîya xwezêdekirin û berdewamîyê" tê dîtin. Tevî ku gelek jinên DAIŞ`ê yên ku me hevdîtin bi wan re kir li kampa Roj (ev jin nû ji kampa Holê hatibûn derxistin) li mijara hebûna rewşên zewacê yan jî jidayîkbûnên nû li beşê "Muhacîrat"

[31] Daxuyanîyeke taybet ji hevserokatîya birêveberîya kampa Holê, Cîhan Henan, ji navenda Firatê re di 29 adara 2023`an de.

li kampa Holê, mukir nedihatin jî, [32] lê yek ji birêveberên rêxistineke girêdayî guhdana zarokan, ku li kampa Holê dixebite, ji me re piştrast kir ku " di dema karê wan ê pêşkêşkirina desteka têgihaştinê û xebatên xwarinî ji dayîkên li kampa Holê re, di adara 2023`an de, wan dît ku zarokek şîrmij, xwedî temenekî derdora 6 mehan, li nav beşê "Muhacîrat" bû!".

Ji alîyekê din ve, û li gorî birêveberên Navenda Orkêş ya rehabîlîtasyona zarokên DAIŞ`ê:[33]" Zarokek hebû navê wî Salih bû, ew zarok sûdanî bû, ew ji kampa Holê anîn navendê, carekê ji serperiştekî navendê re dibêje ku ew ji hêla jinên DAIŞ`ê ve, li beşê Muhacîrat, li kmapa Holê, ji bo têkilîyên zayendî (seksî) hat bikaranîn û îstîsmarkirin" [34]. Ev yek bixwe, li gorî madeya (34) a rêkeftina Cinêvê ya mafên Zarokan, binpêkirineke derheqê mafên zarok de, çimkî ew made dibêje: "gerek e hikûmet zarokan ji bikaranîn û îstîsmara zayendî û destdirêjîyê biparêzin".

**Çar- Metirsîyên derûnî (Pîskolojîk)**

Ji ber ku jîngeh, cihê bixwedîbûnê û rewşên perwerdehîyên di avakirina kesayeta zarokan, awa û asta hizirîna wan, rewşa wan a derûnî û hestyarî de roleke girîng dilîzin, îcarê derbaskirina zarokên DAIŞ`ê ji zaroktîya xwe li nav kampine girtî û konine piçûk ku navgînên rehetîyê yên herî bingrhîn li wan peyda nabin, her wekî guhdan û paqijîyê, û bidûrketina wan ji jîyana sivîl a normal, dê -bê guman- bandoreke mezin li derûnîya van zarokan bikin.

Li gel ku zarokatîya ji wan hatiye dizîn, wê bibe rewşeke derûnî ya ku dê di tevahîya jîyana wan de bi wan re be, ji ber ku veguhestina van zarokan bo navendên desteserîyê û bidûrxistina wan ji malbatên wan dê bandorên derûnî li ser wan kûrtir bike. Ku ne dûr e radîkalî û tundîya wan wek berteka tolhildanê li hember cîhana derve zêde bibe.

Ji ber vê yekê, çiqasî prosesa vegerandina van zarokan bo welatên wan dirêj bike, ewqasî dê rewşa wan a derûnî xerabtir bibe û dê di pêşkêşkirina guhdana bi wan de zehmetî bên dîtin. Di derbarê vê yekê de, profesora bijîşkatîya zarokan li zanîngeha (Parîsê 13), Thierry baubet,

[32] Hevdîtineke li gel 2 jinên DAIŞ`ê li kampa Roj, yek ji wan rûs bû, navê wê "Marîta Mûsa" bû, û ya din îtalî bi eslê xwe tûnisî bû, navê wê "Sonîya El-Xidîrî" bû, di dîroka 20`ê nîsana 2023`an de.

[33] Daxuyanîyeke taybet ji hêla birêveberên navenda Orkêşê ji navenda Firat a lêkolînan, di 10 gulana 2023`an de.

[34] Ji ber ku ev zarok "Salih" bo welatê wî hatibû vegerandin, me nedikarî wî bibînin.

dibêje: "mijara trwma û bêparîya hestyarî û kêmbûna piştgirîyê bo zarokan ne nû ye, û dema jîyîna li nav jîngeheke nebirêxistinkirî û nebûna guhdana geşpêdanî û ya têrker, her berevajî derfetên wan zarokan ên başbûnê bi rêya dabînkirina guhdanê û danîna jîngeheke guncaw ji wan re diguncin".[35]

Lewra, jîngeha ku zarok li kampa Holê tê de mezin dibin - tevî mezinbûna wê, ku ji hin bajarên bakurê rojhilatê Sûrîyayê mezintir tê dîtin- kampeke girtî ye ku bi têl û zêrevanan hatiye dorpêçkirin, û cihê berfireh ên lîstikan û alavên piştgirîya derûnî tune ne, ev kamp zemîneke guncaw e ji bo zêdekirina tundî, tundrewî û tawanan di nav zarokan de.[36]

Li navendên rehabîlîtasyonê û çaksazîyê rewş ne gelekî cuda ye, rast e ev navendên heyî û hindik guhdan û xizmetine ji yên li kampan baştir pêşkêşî zarokan dikin, lê dîsan jî ev navend ji wan zarokan re mîna girtîgehan tên hesibandin, ew hîs dikin ku ji cîhana derve veqetîyayî ne, di demekê de ku paşeroja wan ne dîyar e. di dema hevdîtina me li navenda Orkêşê bi zarokê 17 salî de,ku fransî û bi eslê xwe mexribî bû, û navê wî "A. Z" bû, ew tişta me li jorê gotî belî bû, çimkî dema me jê pirsî ka gelo ew rewşa xwe li navendê çawa dibîne, û endamên navendê çawa danûstandinê pê re dikin? Got: "Navend xweş e, û danûstandina endamên wê bi min re baş e, lê em naxwazin li vir bimînin, em ji xelk û malbatên xwe bidûr in, em nizanin ka çarenûsa me çi ye, me zaroktîya xwe li nav kamp û navendan bihûrand, ez hîs dikim ku ti wate ji jîyana min re nemaye"[37]. Tişta ku zarokê fransî dibêje, piştrast dike ku her çendî di kamp û navendan de hemû rêyên rehetîyê ji wan re werin dabînkirin, û xizmet û dermankirina wan çiqas baş be jî, ev hemû dê hestên wan ên dilgiranîyê neguherînin ji ber windakirina zarokatîya wan ji alîyekî ve, û veqetandina jîyana wan ji malbatê ji alîyekî din ve. Ji vê yekê zêdetir, dema me ji heman zarokî pirsî, gelo ew li navendê an li kampê rehettir e? Wî got: "Tevî hemû şert û mercên wê yên dijwar, ez kampê dipejirînim, ji ber ku bi kêmanî ez li cem dayik û birayên xwe bûm."

---

[35] Lêkolîneke bi sernavê "Guhdana bi zarokên cîhadîstan: awa û astengî", di 16ê sibata 2021`an de di Ansîklopedîya Geşbêdana Zarokatîya dereng de hate weşandin.

[36] Daxuyanîyeke taybet a hevserokatîya birêveberîya kampa Holê Cîhan Henan, ji navenda Firatê ya lêkolînan re, 29`ê adara 2023`an.

[37] Dîmenên gera meydanî ya tîmê Navenda FIratê ya Lêkolînan li navenda Orkêş a rehabîlîtasyonê, 10`ê gulana 2023`an.

Di encamê de, mayîna zarokan li navendên rehabîlîtasyonê têrê nake ku êdî ev zarok vegerin jîyaneke normal, çimkî hebûna wan li devereke xwedî merc, qanûn û bidûrî malbatên wan dihêle ku pirsgirêkên derûnî yên nû li cem wan zarokan peyda bibin. Eger ev zarok li gorî bernameyên navendên rehabîlîtasyonê bi rê ve çûn, dev ji fikirê xwe yê radîkal berdan û dest bi xewna xwe ya jîyana li nav civakeke normal kir, ew dê dîsan rastî jîngeha xwe ya rasteqîn û rîyalist bibe û ji pêkanîna xwena wî re dê bibe kelem.




Wêneyê zarokekî fransî bi eslê xwe mexiribî li navenda Orkêşê


Gelek tecrûbeyên ku pisporên di biwarê "Piştgirîya derûnî, civakî û perwerdehîyî" di derbarê zarokên li navendan encam dan, tişta me li jorê gotî piştrast dikin. Wekî mînak, di dema waneyên xêzkirinê de, ji zarokan tê xwestin ku tişta di fikira wan de, bîranîn û ramanên xwe li ser peleke spî xêz bikin[38], îcarê li vir zarokên dev ji fikirên tudrew berdana, dar an xanî yan jî yarîgehên footboolê û siwareyan xêz dikin, lê yên ku hîna di bin bandora fikirê radîkal û tundrew de ne, mizgeft û çekên şer xêz dikin.[39]

[38] Gelek tabloyên ku van zarokan xêz kirin, bi dîwarên dersxaneyên Navenda Rehabîlîtasyonê ya Orkeşê ve hatin daliqandin.

[39] Daxuyanîyeke taybet ji hêla serperiştên derûnî yên li navenda Hilatê ji navenda Firatê ya Lêkolînan re, 10`ê gulana 2023`an.



Wêneyê ku zarokên DAIŞ`ê li navenda Orkêşê xêz kirin, hinan mizgeft û hinan jî xanî û baxçe xêz kirine




Wêneyê ku zarokên DAIŞ`ê li navenda Orkêşê xêz kirin, bi farisî li serê hatiye nivîsîn "Siwareya min a paşerojê"

Pijîşk û pisporê derûnî yê fransî yê navdar " Boris Sirolnik" ji bo çareserkirina girêka mayîna zarokan li navendên bidûrî malbatên wan ji Fransa û tevaya hikûmetên rojavayî daxwaz dike ku zarokên xwe li gel malbatên wan werbigirin, ev pispor dibêje: "Dayik bingeha hestê ewlehîyê yê wan zarokan in, vegera wan li ser xaka Fransayê bêyî dayikên wan mîna dijminatî û bitenêtîyeke din ji bo wan zarokan e. Ne dûr e ku ew zarok kîna welatê ku bû sebeb ji êşa wî re, bikêşe û ev yek

bihêle ku ev kes li dijî qanûnê derkevin, û ji îdolojîyên radîkal re bibin parîyekî hêsan. Em van zarokan dikin bombeyên berteqînê" [40]. Sirolnik destnîşan dike ku vegernadina zarokan li gel dayikên wan, dikar nermbûneke damarî li cem zarokan encam bide û bihêle ku mejîyên wan zarokan trawmayan derbas bike. Her wiha " çiqasî em bi lez bikin, ewqasî dê ji me re hêsan be, çimkî nehanedana mejî dibe ku cihê xerîze lê mezin dibin, biwerime. Ev yeka han li cem zaerokên piçûk dema bihêrs dibin dixuye ku vediguhere hovîtîbûn û barê dewletê girantir dike. Lê eger em bi lez nekin, dê pêwîstîya me bi gelek wextî hebe, û em dê ji bilî tundrewîyê li cem wan zarokan nebînin, çimkî ti rêyeke din dê li pêşîya wan tune be."[41]

## Pênc- Paşguhkirina rehabîlîtasyonkirina zarokên sûrî û îraqî

Di bernameyên guhdan û rehabîlîtasyonê yên ji alîyê Rêveberîya Xweser û rêxistinên navdewletî ve bi rê ve diçin, serkêşî ji zarokên bîyanî re ye, çimkî wekî xetera herî berçav tên dîtin, lê li hemberî vê yekê bêhtirî 27 hezar zarokên sûrî û îraqî li kampa Holê tên paşguhkirin.

Lê eger em bên rastîyê, ev zarokên han jî xeterîyeke wan a cidî li ser tevaya herêmê heye, bi taybet ku roj bi roj hejmara wan li nav beşên sûrî û îraqîyan zêdetir dibe, di encama jidayikbûnên ku çêdibin de.

Di milê rehabîlîtasyonê de, navend xizmeta dewletên bîyanî dikin, zarokên wan ji nû ve perwerde dikin da ku zû tevlî civakên xwe bibin, û lêçûn û westîbûnê ji ser milên wan dewletan radikin. Lê xeterîya herî berçav li ser herêm û gelên li herêmê her zarokên sûrî û îraqî ne ku di nava jîngeheke tundrew û tijî sûc de rabûne, bêyî ku ti bernameyeke rehabîlîtasyonê yan çaksazîyê li navendan bibînin, û eger hin bernameyên guhdan û geşepêdanê ji hêla rêxistinên navdewletî û xwecihî ve li kampên Hol û Roj dîtibin jî, lê dîyar e ku ev bernameyên han lawaz in, ji ber ku rêjeya sûc û binpêkirinan, bi taybet li kampa Holê, her zêde dibe.

Ji ber ku gelek zarokên sûrî û îraqî di hundirê kampê de bûne girûpên metirsîdar ku dizî û xirabkarîyê dikin, wek xirabkirin an dizîna kamerayên çavdêrîyê û tabloyên enerjîya rojê. Her wiha êrîşkirin û talankirina ofîs û embarên rêxistinan, û êrîşbirina li dijî zêrevanên

[40] Lêkolîneke bi navê "Guhdana derûnî ji zarokên Cîhadîstan re: Rê û astengî" di 16ê Sibata 2021-an, di Ansîklopedîya Geşpêdana Zarokatîya Destpêkê de hate weşandin.
[41] Jêdera navborî.

parastina kampê, ev yek nîşan dide ku ew dê metirsîyê li ser civakê bikin eger ji kampê derkevin û bi civakên xwecihî[42] re tevlihev bibin. Di vê çarçoveyê de, Dr. Îsam Ebdulmecîd Hicazî, mamosteyê derûnnasîya perwerdeyî li zanîngeha Qahîrayê, dibêje: " "Ev zarok dibin bombeyên berteqînê yên ku ji ewlehî û aramîya civak û welatan re dibin gefek. Bi rastî ev zarok dibe ku di demeke nêz de bibin endamên çalak ên rêxistinên terorîst."[43]

Tevî hebûna gelek dibistan û navendên perwerdeyê li kampa Holê, lê ji eslê 32 hezar zarokên li kampê, tenê nêzî 10 hezar zarok diçin dibistan û navendên perwerdeyê ku ji alîyê rêxistinên nehikûmî û navneteweyî ve tên birêvebirin û ev yek tê wateya ku piranîya zarokan di van kampan de bê perwerde mezin dibin, û ev zarok bixwe dikarin bi hêsanî ji alîyê dayikên xwe ve bên bikaranîn û fikirê radîkal û tundrew ji wan dayikan bi rêya "dewreyên şer`î" werbigirin.[44]

**Mijara duyem: kêşeyên dosyaya zarokên DAIŞ`ê**

Dosyaya zarokên DAIŞ`ê li kmapan û navendên rehabîlîtasyonê li Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê gelek kêşeyên qanûnî, civakî û sîyasî raxistin ber çavan. Her çiqasî di dîtina çareserîyeke domdar ji vê dosyayê re de dereng man, ewqasî ev kêşe dê kûrtir û tevlihev bibin. Li vir, em kêşeyên herî girîng bîbin zimên:

**Yek- Windabûna hestê girêdana van zarokan bi welatên wan ên resen**

Mayîna zarokan di van qas salan de li nav kamp û navendên rehabîlîtasyonê, ji welatên xwe yên resen bi dûr û derbasnekirina zaroktîya xwe bi awayekî xwezayî, hiştin ku hestê van zarokan bi welatên wan ve girêdide ji nav biçe. Bi demê re, û di wextekî de ku welatên wan ew paşguh kirine, dê zehmet be ku ev zarok tevlî civakên xwe yên normal bibin, nemaze ku berê ti têkilîyên wan ên hevaltîyê, her wiha bîranînên wan ên zaroktîyê di wan civakan de tune ne, ev bixwe dibe ku dijminatîya wî welatî li cem wî zarokî peyda bike, îcarê di encamê de dê meseleya

---

[42] Daxuyainyeke taybet a berpirsê beşê Antîterorê li kampa Hol û herêma Cizîrê, ji navenda Firatê ya lêkolînan.

[43] Raporek li ser malpera Rewangeha El-Ezher ji bo Têkoşîna li Dijî Tundrewîyê, bi sernavê "Zarokên DAIŞê di hevsengîya derûnî de", serdana dawî 20ê Hezîrana 2023an. https://2u.pw/fJEEkrO

[44] Daxuyanîya hevserokatîya birêveberîya kampa Holê, Cîhan Henan, ji navenda Firatê re, di 29`ê adara 2023`an de.

tecnîdkirina van zarokan ji hêla rêxistin û komikên cîhadîst ve pirr hêsan be, û ne dûr ku ev zarok sibe operasyonên terorîst li dijî civakên xwe pêk bînin.

Tişta me li jorê gotî di hevdîtina me ya li gel zarok (A.N 17 salî) ji Qirgizîstan, li navenda Orkêşê belî bû, ewî zarokî dida xuyakirin ku hestê girêdana wî bi welatê wî yê resen re êdî nemaye, û êdî li şûnê welatekî din di xeyalê xwe de xêz dike, û xewna wî ku dema ji navendê derkeve biçe li wî welatê nû bijî. Dema me ji wî zarokî pirsî, gelo piştî ji Sûrîyayê derkeve ew dixwaze li welatê xwe veger? Wî got: xewna min e, piştî ez ji vir derkevim, biçim Japonyayê". Zarok bersiva xwe li vê sedemê vegerand: "dema ez li kampa Holê bûm, temenê min 13 salî bû, dayika min nedihişt ku ez ji kampê derkevim; ji ber ku ditirsa ku hêzên parastina kampê min bibînin û min bibin navendên rehabîlîtasyonê, ez jî aciz dibûm, lewra hin jinên li kampê "El-Îxwat" telefoneke xwedî karteke înternetê ji min re peyda kir, îcarê dema li ser înternetê ez digerîyam û min vîdyo temaş dikirin, min dît ku welatê herî bala min kişand Japonya bû, çimkî avahî û xanîyên wê pirr xweşik bûn, ji hêla teknolojîyayê û cûreyên xwarinê ve pêşketî bû"[45].



Wêneyê zarokekî Qirgizîstanî li navenda Orkêşê

DI der barê pirsgirêka zarokên ku hestê girêdana xwe bi welatê xwe re winda dikin de, derûnnas û norologê Fransî Boris Sirulnik dibêje: "Her ku

[45] Serdana navenda Firatê ji navenda Orkêşê re, 10ê gulana 2023`an.

li wir bimînin, ew qas ji Fransayê hez nakin, lê heke em niha li wan xwedî derkevin dikarin bên vegerandin." "Ez dibêjim qey serokê Fransayê ditirse ku zarokên vegerîyane bibin terorîst. Lê ez dibêjim na, û hizira min pêkan e, çimkî li ser bingeha têbînîyên zanistî ye. Ger em di temenek pir piçûk de li wan zarokan bixwedî derkevin, ew dê nebin cihê metirsîyê."[46]

## Du- Zarokên ji bav û dê sêwî ne

Piştî têkçûna DAIŞê li asêgeha xwe ya dawîn li bajarokê "Baxozê", rêxistinê bi hezaran zarokên sêwî li pey xwe hiştin. Ev zarok yên herî mexdûr in, ji ber ku ketine navbera agirê mayîna li kampan û pirsgirêka vegera bo welatên xwe. Her wiha tu belgeyên ku nasnameya wan îspat bike tune ne. Hin ji wan ji alîyê jinên DAIŞ'ê ve hatin bixudankirin, yên ku îdîa dikin ku ew zarokên wan in bêyî ku ti belgeyek vê yekê piştrast bike, bi armanca ku wan li kampê bihêlin û nehêlin ku vegerin welatên xwe. Ji ber ku -li gor bawerîya wan- ev "zarokên "xîlafet"ê ne, divê li ser ramanên rêxistinê bên mezinkirin û rojekê ew ê vê "xîlafet"ê biparêzin.[47]

Ev zarokên mijara gotinê, ku ji alîyê jinên DAIŞ’ê ve tên bixudankirin, bê guman rastî metirsîyên îdeolojîk û perwerdehîya tund tên ku bibin nifşê nû yê artêşa DAIŞ’ê ya paşerojê. Nemaze ku di mijara nasîna esl û neteweya wan zarokan de zehmetî hene, îcarê di encamê de ew zarok bixwe nizanin ka eslê wan ji kû ye.

Lê beşê din, ê ku ti jinên DAIŞ`ê wan bixudan nakin, li 4 navendên guhdana bi zarokên sêwî, li nava kampa Holê, dimînin, ev navend ji hêla rêxistina UNICEF`ê ve bi hevkarîya birêveberîya kampê hatin avakirin. Dibe ku di mijara vegerandina zarokan bo welatên wan ên resen de, şensê vî beşê dawîn bêhtir hebe, nemaze ku pirranîya welatên ku zarokên xwe werdigirin, girîngîyê didin zarokên sêwî û wan didin pêş. Lê dîsan jî ev nayê wateya ku xeterîya wan zarokan bi dawî tê, çimkî ne dûr e ku ew zarok bixwe ji hêla hikûmetên xwe ve di her warî de bên bikaranîn: her wekî tecnîdkirina wan weke çeteyan di şerên leşkerî de, û di ber

[46] Lêkolîneke bi navê "Guhdana derûnî ji zarokên Cîhadîstan re: Rê û astengî" di 16ê Sibata 2021-an, di Ansîklopedîya Geşpêdana Zarokatîya Destpêkê de hate weşandin.
[47] Rêveberek ji navenda Hilatê ya rehabîlîtasyon û guhdana bi zarokan ji navenda re eşkere kir.

berjewndîyên wan hikûmetan de, û dibe ku ji hêla komikên cîhadîst ve bên bikaranîn, û parîyekî hêsan bin ji wan re.[48]

Tişta ku dihêle guman di derbarê çêbûna bûyerine bi vî rengî di derheqê zarokên sêwî de encam bide ew ku hin welat –weke Rûsyayê- gelek zarokên bêxwedî wergirtin, bêyî ku rastîya netewe û eslê wan bikole. Rûsya wan zarokan werdigire bêyî ku piştrast bibe ka gelo ev zarok rûs in an na, ew jî bi hinceta pêşkêşkirina belgeya DNAyê. Lê, li gorî Gerînendeya Têkilîyên derve, ku ew alîyên duyem ê fermî di prosesa radestkirina zarokan de ye, ti rêkarên piştrastkirina wan taqîyan (fihûsat) tune ne.[49]


Îcarê, da ku Rêveberîya Xweser nebe cihê berpirs û perpirsyartîya çarenûsa zarokên tên radestkirin negire ser milê xwe, belgenameyeke fermî ya taybet bi radestkirinê amade kiriye, di vê belgenameyê de hemû agahîyên girêdayî zarok hene, û tê de alîyê ku zarok werdigire soz didin ku berpirsyariya guhdana bi wî/wê zarokî/ê bigirin ser milê xwe. Ev belge ji hêla nûnerên hikûmeta ku zarokan werdigire û nûnerên gerînendeya Têkilîyên Derve ya Rêveberîya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê ve tê îmzekirin, û di konferanseke rojnamevanî de, piştî ku rêkarên radestkirinê bi dawî dibin, tê ragihandin.[50]

---

[48] Daxuyanîya hevserokatîya birêveberîya kampa Holê, Cîhan Henan, ji navenda Firatê re, 29`ê adara 2023`an.

[49] Daxuyanîya endamê Desteya Birêveber li gerînendeya TêkilîyênDerve – beşê karûbarên mirovî, Xalid Îbrahîm, ji navenda Firatê re 25`ê adara 2023`an.

[50] Çavkanîya navborî.


الإدارة الذاتية لشمال و شرق سوريا
RÊVEBERIYA XWESER A BAKUR Û ROJHILATÊ SÛRIYEYÊ
KUZEY VE DOĞU SURIYE ÖZERK YÖNETIMI

**وثيقة إعادة الرعايا الأجانب إلى أوطانهم**

بناء على طلب حكومة ..............، وبناء على التزام الإدارة الذاتية لشمال وشرق سوريا بمبادئ حقوق الإنسان، والمواثيق الدولية التي تلتزم بحماية حقوق الإنسان وصونها؛

ومراعاة لرغبة مواطني دولة .............. المتهمين بالانضمام إلى تنظيم داعش الإرهابي، والذين لم يتم العثور على أدلة كافية ضدهم بعد التحقيقات التي أجريت معهم تثبت تورطهم في أعمال مخالفة للقوانين الصادرة عن الإدارة الذاتية لشمال وشرق سوريا أو أي أعمال إرهابية في مناطق الإدارة الذاتية لشمال وشرق سوريا؛

قررت الإدارة الذاتية لشمال وشرق سوريا تسليم المواطنين (أسماء المواطنين الذين سيتم إعادتهم) إلى ممثل حكومة .................. السيد ................. ، صفته الرسمية ........................

نحن، بصفتنا الإدارة الذاتية لشمال وشرق سوريا، نؤكد أن مواطني دولة ................ لم يتعرضوا لأي نوع من الضغط المعنوي أو الجسدي أثناء وجودهم في مناطق الإدارة الذاتية لشمال وشرق سوريا.

تأمل الإدارة الذاتية في الحفاظ على تواصلها وتنسيقها مع الدول بعد إعادة رعاياها إلى بلدانهم، لمتابعة الإجراءات الأمنية أو القضائية المتخذة بحقهم، أو عملية إعادة تأهيلهم ودمجهم في مجتمعاتهم.

**ممثل عن الإدارة الذاتية لشمال وشرق سوريا**
**السيد** ....................................
**صفته الرسمية** ................................

**ممثل حكومة** ..........................
**السيد** ..........................
**صفته الرسمية** ..........................

**نسخة إلى:**
- حكومة ..................
- دائرة العلاقات الخارجية
- وحدات حماية المرأة (YPJ)
- هيئة المرأة في الإدارة الذاتية لشمال وشرق سوريا

Belgeya vegerandina bîyanîyan ku ji alîyê hikûmetên zarokan werdigirin û Gerînendeya Têkilîyên Derv eve tê dagirtin

## Sê- Zarokên ji zêdeyî neteweyekê û ji dayikekê

Hin welat qebûl dikin ku zarokên xwe werbigirin, lê divê belgeyên wan ên ku piştrast dikin ku ew ji wî welatî ne hebin, yan jî gerek nasnameyên wan bi wan re bin, lê li vir, gelek kêşe hene ku rê li ber vegera van zarokan bo welatên wan digirin, her wekî: çêbûna gelek zarokan ji jinên DAIŞ`ê re ku her zarokek ji neteweyeke cuda ye, ew jî di encama şûbûna wan jinan di dema desthilatdarîya DAIŞ`ê de zêdetirî carekê, ji çekdarên xwedî neteweyên cuda yên DAIŞ`ê.

Ev kêşeya han rê li ber vegera van zarokan bo welatên wan digire, eger yek ji hikûmetên bîyanî, bi taybetî yên “erebî” bixwaze rojekê welatîyên xwe vegerîne, ew dê rûbirûyê kêşeya zarokên xwe yên ji çend netewe û

etnîkî bibin. Bi taybetî jî ji ber nebûna delîlên der barê nasname û neteweya van zarokan de. îcarê ew welat dê dayikê vegerînin lê dikarin zarokên wê yên ku ji neteweyên ne mîna neteweya dayikê ne, qebûl nekin.

Pirsgirêka duyem di hebûna dayikên sûrî de ye, ku bi çend endamên DAIŞê yên ji neteweyên cuda re zewicîn û ji wan zarok anîn. Ji ber vê yekê, eger welatên bîyanî bixwazin zarokên xwe werbigirn, ew ê dayika sûrî bi van zarokan re qebûl nekin, û zarokên wê li ser çend welatan li gorî neteweyên wan bêne dabeşkirin, û ev tê wateya cudakirina zarokan ji dayikên wan. Anku binpêkirina eşkere ya peyman û yasayên mafên zarokan e.

Hêjayî gotinê, gelek hikûmetên rojavayî, weke Siwêd û Almanyayê, sala 2020`an şanderên xwe şandin kampên Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê da ku bi jinên DAIŞ`ê re rûnin û ji wan bizanin ka gelo ew jin dixwazin zarokên wan bi tena serê xwe vegerin welatên xwe yan na, îcarê wê demê, wan jinan dan xuyakirin ku ew naxwazin bêyî wan, zarok vegerin welatên xwe yên resen.[51]

Li alîyekî din, eger jinên sûrî qebûl nekirin ku zarokên wê yên xwedî neteweyên cuda vegerin welatên xwe yên resen, dê pirsgirêka bidestxistina wan zarokan ji nasnameya sûrî bi xwe re bîne, çimkî ne tenê ji ber ku hikûmeta sûrî bixwe dibe ku dudil be nasnameyê bide wan zarokan, lê belê dibe ku civaka sûrî bixwe jî wan zarokên bîyanî qebûl neke, ji ber weke paşmahîyên rêxsitina DAIŞ`ê ya terorîst dê bên dîtin.

Eger hikûmeta sûrî dayîna nasnameyan ji wan zarokan re red kir, ev tê wateya bêparbûna wan ji mafekî xwe yê herî bingehîn, ku ew jî "mafê bidestxistina nasnameyeke taybet" e, ev mafê ku li gorî madeya 8`an a rêkeftina Cinêvê ya Mafên Zarokan hatiye û dibêje: "Ji mafê her zarokekî ye ku xwedî nasnameyeke taybet be (qeydeke fermî bide xuyakirin ew kî ye, û tê de navên wan, netewe û têkilîyên malbatî hebin), û nabe ti kes zarokan ji nasnameya wan bêpar bike, û eger hatin bêparkirin, gerek e hikûmet di ber bidestxistina wan jê re, alîkar be".

**Çar- Xemsarîya welatên ereban di wergirtina hemwelatîyên xwe de**

[51] Çavkanîya navborî.

Gelek welatên Ewropî û Asyaya Navîn hin hemwelatîyên xwe ji zarokên sêwî û hin zarokên bi dayikên xwe re werigritin, wek: (Fransa, Almanya, Swêd, Danîmarka, Belçîka, Norwêc, Fînlandîya, Ukrayna, Swîsre, Ozbekistan, Kirgizistan, Tacîkistan, û Kazaxistan). Lê Rûsya ji welatên ku herî zêde hemwelatîyên xwe, bi taybetî jî ji zarok, wergirtine ye. Lê tevî ku hemwelatîyên welatên erebî ên herî pirr in, nemaze di beşa "Muhacîrat" ên kampa Holê de, ti welatekî erebî însîyatîfa vegerandina wan nekiriye, ji bilî Iraq û Sûdanê, ku ya dawîn vê talîyê tenê du jin û 3 zarok, di adara 2023`an de, vegerandin.

Lê welatên weke (Cezayîr, Maxirb û Siûdîyê) soz dabûn ku ew dê hemwelatîyên xwe bi rêya Hevpeymanîya Navdewletî yan jî bi rêya navbeynkareke sêyem werbigire, ew jî ji ber ku naxwazin danûstandineke rasterast bi Rêveberîya Xweser re bikin, lê tevî wê jî heta niha di vê meseleyê de ti gav neavêtine.[52]

Em dikarin vê xemsarîya welatên erebî di mijara wergirtina hemwelatîyên xwe de li du sedemên sereke vegerînin:

- Nebûna têkilîyên dîplomatîk di navbera hin welatên erebî û Rêveberîya Xweser li Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê de, ji ber ku piranîya welatên erebî naxwazin bi awayekî fermî têkilîyan bi rêveberîyeke nenaskirî re deynin, û ev yek jî zehmetîyan li ber Rêveberîya Xweser, di milê danûstendina bi hikûmetên ereban re ji bo radestkirina hemwelatîyên wan, peyda dike.
- Metirsîya wan welatan ji vegera wan kesên bi ser DAIŞ`ê ve, û bandora wan li ser civakên erebî, û sorkirina welatîyên wê dewletê li dijî wê, çimkî ne dûr e ku ev kesên han careke din vegerin kiryarîyên DAIŞ`ê pêk bînin, li hundirê welatên xwe.

## Pênc- Mayîna zarokan bi dayikên xwe yên tundrew re

Ji ber zêdebûna rêjeya tudrewî û sûcan li kampa Holê, gelek bang – bi taybet ên xwecihî- ji bo derxistina zarokan ji van deran hebûn. Lê veqetandina zarokan ji dayikên wan jî cihê gengeşe û berteknîşanê bû, nemaze ji hêla rêxistinên navdewletî yên têkildarî mafên zarokan.

[52] Daxuyanîya endamê Desteya Birêveber a gerînendeya Têkilîyên Derve- Beşê Karûbarên Mirovî, Xalid Îbrahîm, ji navenda Firatê re, di 25`ê adara 2023`an.

Di gel ku pisporên "tenduristîya derûnî û bêradîkalîzekirinê" hemfikir in ku piştgirîya civak û malbatê yek ji faktorên herî girîng e di prosesa jinûve-tevlîkirinê (jinûve-integrasyon) de, hin kes hişyarîyê didin ku rêbazên pêşkeftî yên hînkirinê ji alîyê jinên DAIŞ ve têne bikaranîn, hewcedarî bernameyên nûveintegrasyonê yên wekhev in ji bo rûbirûbûna wan. Ev ji bilî metirsîyên hînkirina olî ku ji alîyê jinên DAIŞê ve di hişê zarokan de tê çandin. Li rex wê, hejmareke mezin ji çekdarên jin ên DAIŞê, ku berê girêdayî "tabûrên DAIŞê" wek "Tabûra Xansaa" bûn, li hundirê kampê zarokan neçar dikin ku bi hev re bizewicin; ji bo zêdekirina nifşên DAIŞê.

Em werin rastîyê, jinên beşê "Muhacîrat" ji jinên herî berevanîyê di ber DAIŞ`ê dikin û jê re probegendayê dikin in. gelek ji wan naxwazin vegerin welatên xwe, ji ber ku naxwazin di welatekî ne misiliman de bijîn, û hin ji wan hîna jî xewna vegera "Xîlafeta DAIŞ"ê li ber çavên wan e, nemaze jinên ku bi îradeya xwe dev ji welatê xwe berdane û tevlî DAIŞ`ê bûne, û ji endam û serkirdeyên wê zewicîne. ev jin ji hemûyan zêdetir hêvîya vegera "Xîlafetê" li cem wan xurt e. ev tişta han di dema hevdîtina me bi jina îtalî-fransî "Sonîya Elxidêrî" re dîyar bû, ew bixwe di îlûna 2023`an de ji kmapa Holê bo ya Roj hatiye veguheztin. Dema me jê pirsî gelo ew çawa tevlî DAIŞ`ê bû, wê got: min fakulteya torîzêm li Îtalîyayê dixwend, bi rêya înternetê (Facebook) min endamekî DAIŞ`ê yê tûnisî nas kir, ew li Tirkîyayê bû, paşê min dev ji karê xwe yê di biwarê torîzmê de berda, û guh da olê, lewra min xwe heciband, piştre ez çûm Tirkîyayê, bêyî ku haya malbata min jê hebe, û bi wîyê tûnisî re zewicîm û em bi hev re hatin Sûrîyayê, min du zarok jê anîn, û dawîyê hevjînê min di şerekî li bakur rojhilatê Sûrîyayê hat kuştin"[53].

Me jê pirsî, çawa kete belaya DAIŞ`ê, nemaze ku ew jineke xwendevan e û pispora biwarê torîzmê ye, û gerek e li ser tevya cîhanê vekirî be û netewe û çandên din bipejirîne? Wê got: "ez dixwazim di nava sînorê dewleta xîlafeta îslamê de bijîm, û min bi hevjînê xwe re li hev kir ku di hembêza Dewleta Îslamîk li Sûrîyayê bijîn". Di axaftina xwe de, wê jinê pesinê DAIŞ`ê jî da û destnîşan kir ku wê "Şerî`eta Îslamê pêk tanî", ev bixwe jî nîşaneya wê yekê ye ku ev jin hîna jî bawerîya wê bi fikirê

[53] Hevdîtineke taybet di gera meydanî ya navenda Firatê li kampa Roj, 20`ê nîsana 2023`an.

DAIŞ`ê û jinûve-vegera "Dewleta Xîlafetê" tê, û dê vê bawerîyê di serê zarokên xwe de jî biçêne.[54]

Joe Bekar, birêvebera Parastina Mafên Zarokan a Rêxistina Mafên Mirov (HRW), di derbarê sedemên redkirina hin jinan ji derketina ji kampê de dîyar dike ku gelek sedem hene, ji wan: "hin jin naxwazin li dewleteke ne-misilman bijîn, an jî dibe ku ditirsin ku rastî cudahîyê û dadgehkirinê bên. Di hin rewşên din de, dibe ku hevjîn di zindanê de be, lewra jin dixwaze ku li benda wî bimîne heta ku derkeve, ji ber ku naxwaze bêyî wî, biryareke bi vî rengî (derketina ji kampê) bistîne. Û ev tişta han ne her dem di berjewendîya zarokan de ye".[55]

Li alîyekî din, jinên DAIŞ`ê yên ereb û xwedî du nasname her dixwazin vegerin welatê xwe yê erebî, ne yê ewropî, ji ber ku "qanûnên dewletên ewropî jina ku bi hevjînê xwe re tevlî DAIŞ`ê bûye, weke wê weke hevjînê xwe tê hesibandin, anku ew jî sûcdar tê dîtin, ji ber ku li Ewropayê jin jî xwedî kesayeteke serbixwe û di biryarên xwe de azad e, lewra ew jî tê dadgehkirin. Lê li cem welatên erebî û îslamîk, jin dikare îdîa bike ku ew ji alîyê hevjînê xwe ve hatiye neçarkirin ku biçe Îraq an Sûyrîyayê, ji ber ku dewletên erebî û îslamîk her mêr di ser jinê re dibînin û wî weke xwedîyê biryara malbatê dihesibînin, anku "Mêr berpirsê jinê ye"[56], di encamê de, mêr berpirsyartîya mezin digire ser milê xwe, û bi vî rengî jin li welatê erebî dikare ji cezakirinê bifilite, yan jî cezayê wê sivik be.

Ji ber van metirsîyên jinan li ser zarokan, birêveberîya kampê hewl da ku zarokan biparêze û wan ber bi navendên rehabîlîtasyonê ve bibe, îcarê tevî ku armanca ji veguheztina wan parastina zarokan ji fikirê tundrew bû jî, raporek ji alîyê Encûmena Mafên Mirovan a Neteweyên Yekbûyî ve NY di Çileya 2023an de hat weşandin, û tê de veguhestina zarokan ji kampa Holê bo navendên rehabîlîtasyonê wekî "revandina zarokan ji malbatên wan, û veguhestina wan bo cihên nedîyar" hat pênasekirin.

Lê, Nivîsgeha Karûbarên Dad û Çaksazîyê ya Rêveberîya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê bersiva van tawanan da û di daxuyanîyekê de

---

[54] Çavkanîya navborî.

[55] Raporeke malpera DW a almanî bi sernavê: "Kampa Holê: gelo ne dema wê ye ku zarok derkevin, heta ku bêyî dayikên xwe jî bin?". Serdana dawîn 20`ê Hezîrana 2023`an https://www.dw.com/ar/

[56] Ev axaftina zarokekî fransî bi eslê xwe tûnisî bû, li navenda Orkêşê ji navenda Firatê re axivî, û li gorî wî, ev axaftina han ji devê dayika xwe û hin jinên mexribî li kampa Holê bihîst.

got: “Em van îdiayan ji binî ve ne rast dibînin, ji ber ku hemû navendên desteserkirinê û rehabîlîtasyonê li ber gelek rêxistinan vekirî ne, û em li gorî mekanîzmayên bêalî û prensîbên qanûnî yên ku mafên mirovan diparêzin dixebitin. Em bang li Encûmena Mafên Mirovan dikin, ku serdana van navendan bikin, her wiha em tekez dikin ku ti devereke girtina zarokan a nedîyar tune ye û em qet wan naxine zindanan".[57]

Li hemberî vê yekê, gelek mafnas dibînin ku cudakirina wan zarokan ji dayikên wan ne li dijî madeya 9`an ji rêkeftina Cinêv a Mafên Zarok e, çimkî ev made bixwe dibêje "gerek e malbat bi tevayî were parastin", "û eger ev zarok guhdana guncaw û têrker ji dê û bavê xwe wernegire, gerek e ji wan were cudakirin (wek mînak: eger ev dê û bav te`darîyê li zarokan bikin û guh nedin wan).

Nexwe, mayîna wan zarokan bi dayikên wan re, ji bo zarokan bixwe xeterî ye, lewra ne pirsgirêk e dema li gorî rêkeftina Cinêvê, ew zarok ji dayikên wan bên cudakirin, çimkî zarok zirirê ji fikirê dayikên xwe dibînin.

Daniel Kohler, birêveberê Peymangeha Almanî ya Lêkolînên Radîkal li Stuttgartê dibêje: "Komikên radîkal mejîyê zarokan şûşt û tijî ramanên ku nirxên rojavayî xirab dibînin kir, her wiha ew tevlî rahênanên şerî kirin û hin caran ew neçar kirin ku çekan hilgirin û kiryarîyên tundrew pêk bînin, evê yekê hişt ku jinên DAIŞ`ê li şûna mamosteyên NY li kampan wan zarokn hîn bikin û çanda terorê di mejîyên wan de biçênin, ew jî bi rêya dubarekirina têgihên bi ser tundrewîyê û terorê ve û pevgirêdana wan bi opersayonên cîhadî, û kafirdîtina çi kesekî ne li gorî bawerîya wan, an jî heta bi cilûbergên wan kesan jî eger ne mîna yên DAIŞ`ê bin".[58]

Ji bo parastina zarok û bidûrxistina wî ji metirsîyên îdyolojîya tundrew û leşkerkirina paşerojê, pêwîst bû zarok ji dayîka wî ya tundrew were veqetandin. Ji ber vê yekê Rêveberîya Xweser berpirsyarîya xwedîderketin û mezinkirina van zarokan girt ser xwe, îcarê li gorî naveroka madeya 9`an (benda D) ya yasaya jimare 7 a sala 2022, Rêveberîya Xweser giringîya parastina jîyana zarokan garantî dike, bi terbîyekirineke saxlem û bi ewle û dûr ji şer û pevçûnên çekdarî, û

[57] Beşek ji daxuyanîya Nivîsgeha Karûbarên Dad û Çaksazîyê ya Rêveberîya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê, 18`ê sibata 2023`an.

[58] Raporteke rojnameya El-Ereb a londinî bi sernavê "Zarokên DAIŞ`ê: Qurbanîyên jibîrkirî û nifşê nû ji terorîstên paşerojê", 20`ê hezîrana 2023`an, https://alarab.co.uk/


misogerkirina nebeşdarbûna wî di şer û çalakîyên leşkerî de, û garantîkirina rêzgirtina mafên wî di rewşên awarte, karesat, şer û pevçûnên çekdarî de, her wiha Hemû tedbîran digire ji bo şopandin û cezakirina her kesê ku sûcê şer, jenosîd, an sûcên dermirovî li dijî zarokekî, an leşkerkirina bi zorê, teşwîqkirin, an tirsandinê, ku tê wateya destdirêjîya rasterast li ser zarok, pê bîne.

Têbînên serperiştên van zarokan li navenda Hilatê, ji me re piştrast dikin bê çiqasî ev zarokên han bi fikirê tundrew ji hêla dayikên xwe ve hatin tijîkirin û têrkirin, bi taybet zarokên ji 8 salan û ber bi jorê ve, nemaze dema ev zarok tişta di bala xwe de li ser kaxezan xêz dikin. Wan serperiştan ji me re piştrast kirin ku dema pêşwazîya wan zarokan –weke cara yekem, piştî ji dayikên xwe yên zindankirî tên veqetandin- li navendê dikin, ew zarok bi dijminatîyekê nêzî wan dibin, naxwazin stran û mûzîkê guhdarî bikin û guhên xwe digirin, ji ber ku "guneh" e, her wiha temaşekirina televizyên jî red dikin.[59]

Li rex wê yekê, ji waneyên xêzkirinê (nîgarkêşîyê) dîyar dibe bê çiqasî ev zarokên han xeternak in, çimkî piştî ku bi zehmetîyekê serperiştîyên wan zarokan li navenda Hilatê ew zarok razî kirin da ku wêneyan xêz bikin, îcarê tişta di bala wan zarokan de di wêneyên ku xêz kirine de dîyar dibe, her wekî çawa hinan ji wan çekdarekî DAIŞ`ê, di destê wî de ala rêxistinê û di destê din de demançeyek hebû ku danîbû ser serê kesekî serîtewandî xêz kiribû. Hinan jî wêneyê şûrekî û serîne jêkirî xêz kiribûn, her wiha wêneyên kampekê û balafireke leşkerî di ser serê kampê re diçe jî hebû, ku weke nîşaneya balafira Hevpeymana Navndewetî ya li dijî DAIŞ`ê bû, li kêleka kampê kesekî tundrew, hov û xwedî diranên mezin û bi qiloç, ku xwîn ji devê wî diherikî hebû, ev jî nîşan dide bê ew zarok hêzên ku kampê diparêzin, çawa dibînin.[60]

[59] Daxuyanîya birêveberîya navenda Hilatê ya rehabîlîtasyon û guhdana bi zarokan ji navenda Firatê re, 25`ê gulana 2023`an

[60] Gera meydanî ya tîmê navenda Firatê li nav navenda Hilatê ya rehabîlîtasyon û guhdana bi zarokan, 25`ê gulana 2023`an.



Wêneyên ku zarokên DAIŞ`ê xêz kirin, temenê wan di navbera 8-13 salan de, li navenda Hilatê

Berpirsên navenda Hilatê tekez kirin ku, piştî xebateke mezin di biwarê rehabîlîtasyonê de, wan karîye hinek guhertin di bîr û tevgera van zarokan de pêk bînin. Îcarê ev zarok bi bihîstina muzîkê kêfxweş dibin û bi kelecan fîlimên karton li ser TV-yê temaşe dikin. Lê dîsan jî, li gorî birêveberîya navendê dema zarok danê êvarê vedigerin cem dayikên xwe yên li girtîgehê û sibê tên navendê, reftarên wan guherîye û careke din gotinên wekî "muzîk, televîzyon û xêzkirin "heram" in dibêjin. Ev yek jî nîşan dide ku ev zarok çiqasî ji dayikên xwe û tişta ku di serê wan de tê çandin bi bandor dibin!.

Her li gorî birêveberîya navenda Hilatê, zarokên ji temenê 3-7 salan, zû bi zû û bi hêsanî tên rehabîlîtasayonkirin (jinûveperwerdekirin) û danûstanên bi serperiştan re dikin, lê zarokên ji 8 sala û bi jorê ve, zû bi zû bi prosesa rehabîlîtasyonê re naguncin û tevnagerin, lewra pêwîstîya wan bi xebatên mezintir û bernameyên rehabîlîtasyonê yên pêşketîtir heye. A girîng her ew e ku ji dayikên wan bên bidûrxistin heta ku prosesa rehabîlîtasyonê bi dawî bibe, çimkî mayîna wan zarokan li gel dayikên wan dihêle ku zarok di navbera tişta ku li navendê dibînin û tişta ku dayikên wan ên tundrew ji wan re dibêjin şaş bimînin û tev li hev bibin.

Serperiştên navendê didin xuyakirin ku bandora dayikan bi rengekî eşkere li zarokên keç bêhtir belî. Dema me (tîma navenda Firatê ya lêkolînan) serdana navenda Hilatê kir, û em derbasî refan bû (zarokên 8-13 li wan bûn) û me hewl da ku wêneyên wan zarokan bikêşin, me dîta çawa keç revîyan û di bin maseyan de xwe veşatin da ku wêneyên wan

neyên kêşan, her di wê kêlîyê de, zarokên kur pişta xwe da me û hinan ji wan bi dengekî bilind gotin: "wêneyên keçan nekêşin!". Helbet ev jî nîşaneya wê yekê ye ku fikir û rênimayên DAIŞ`ê hîna bi rêya dayikan digihin van zarokan.[61]



Zarokên DAIŞ`ê li navenda Hilatê, tê de xuya ye bê çawa dema me wêne kişand, keçan xwe di bin maseyan de veşart

## Dumahî

Di vê lêkolînê de, me dosyaya zarokên DAIŞ`ê li kamp û navendên rehabîlîtasyon û guhdanê bi awayekî kûr vekola, ew jî ji ber metirsî û xeterîyên civakî, qanûnî û sîyasî yên vê dosyayê. Me giranî da mayîna zarokan li nav kampan li gel dayikên wan, ji ber ku ev kampên han jîngeheke guncaw a bixwedîkirin û belavkirina fikirê tundrew e, her wiha me da xuyakirin ka gelo navendên rehabîlîtasyon û guhdanê heta çi redeye dikarin rê li ber xeterîya zarokên DAIŞ`ê bigirin an jî kêm bikin. Paşê, me destê xwe danî ser xeterî û kêşeyên dosyaya zarokên DAIŞ`ê yên niha û paşerojê. Îcarê, li ser esasê vê lêkolînê em gihane gelek encam û pêşinyaran.

## Yek- Encam

- Kampên Hol û Roj xwedî taybetmendîyek û karektereke cuda ne, ne mîna kampên penaber û koçberan in. çimkî ev herdu kamp hem

[61] Çavkanîya navborî.

penaberên îraqî û koçberên sûrî yên ku ji ber sûc û binpêkirinên DAIŞ`ê û komên çekdar revîyane, û hem jî malbatên DAIŞ`ê ji jin û zarokan, ku piştî têkçûna DAIŞ`ê li Baxozê, li kmapa Holê ( vê dawîyê li kampa Roj) hatine bicihkirin, vedihewînin. Ev taybetmendîya han dibe ku van herdu kampan bidûrî karekterê wan ê sivîlî û mirovî bixe, û wan ber bi dîyardeya "leşkerkirin"ê ve bibe, ji ber ku di nava wan kampan de kesin hene ku hîna bi tundî bawerîya wan bi fikirê "Xîlafeta DAIŞ`"ê heye û pabendî wî fikirî ne, û bi her awayî wî fikirî di serê zarokên xwe de diçênin, li ser esasê ku "Xîlafeta" wan "li ser lingê xwe ye û berfireh dibe".

- Kampa Holê jîngeheke guncaw a geşbûna fikirê radîkal ê DAIŞ`ê ye, û rêya DAIŞ`ê ya bicihanîna stratejîya xwe di avakirina artêşeke nû ji paşmayînên xwe (Eşbal El-Xîlafa) de ye, ew jî ji ber mezinbûna kampê, cihê wê yê bidûr ku şaneyên DAIŞ`ê yên razayî lê pirr in, û zehmetbûna kontrolkirina kampê ji hêla ewlekarî ve (nemaze beşê Muhacîrat).
- Rêveberîya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê bi armanca sivikkirina zextên li ser kampa Holê, beşek ji jinên DAIŞ’ê û zarokên wan veguhestin kampa Roj. Rast e kampa Roj li gorî kampa Holê, çi di biwarê rêveberî û çi jî di yê kontrolkirina ewlekarî de, baştir tê dîtin, lê lawazî û valahîyên wê hene ku DAIŞ û jinên wê dikarin ji bo derbaskirina îdyolojîya xwe ya tundrew û stratejîya vejandina "Dewleta Xilafetê" bikar bînin, her wekî: Hêsanîya peywendîya di navbera jinên DAIŞê û zarokên wan û malbatên îraqî û sûrî û zarokên wan de (li dibistanê, bazara hevbeş...hwd), û hêsanîya gihandina têlefoneke destî ya bi înternetê ve girêdayî ye bo jinên DAIŞ’ê.
- Li gorî rêkeftinên navdewletî yên taybet bi parastina zarokan (nemaze Rêkeftina Cinêvê), û li gorî qanûna taybet bi mafên zarokan a hejmar 7 ji sala 2022`an, Rêveberîya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê hejmarek ji zarokên DAIŞ`ê, ku temenê wan jora 12 salan in, veguheztin navendên (Hûrî û Orkêş) ku taybet ji bo rehabîlîtasyon û guhdanê hatine avakirin. Lê ev navendên han hewcedarî pirsporên di biwarê piştgirîya derûnî, tenduristî, perwerde û hînkirinê de ne, her wiha pêwîstîya wan bi piştgirîyeke xwecihî û navdewletî (rêxistin û civaka navdewletî) heye. Lê dîyar e ku veguheztina wan zarokan di temenekî jora 12 salan de gelekî

dereng e, çimkî zarokên jora 12 salan, zehmet e bi hêsanî ew fikir û rênimayên DAIŞ`ê yên ku bi rêya dayikên wan di serê wan hatin çandin, bi rêya bernameyên rehabîlîtasyon û guhdanê werin rakirin. li alîyekî din, navenda Hilatê ku ji alîyê Hevpeymanîya Navdewletî ve hatiye avakirin û li jêr serperiştîya desteya jinê ye, armancên xwe yên xwestî pêk nayêne, ji ber ku tişta zarok sibehê li navendê fêr dibe, danê êvarê dema diçe cem dayika xwe ya radîkal ji mejîyê wî tê jêbirin.

- Xeterîya paşmahîyên DAIŞ`ê ji DAIŞ`ê bixwe wek rêxistin ne kêmtir e, û çawa ji bo têkbirina wê hevpeymanîyeke navdewletî hat ava kirin, gerek e ji bo dosyaya zarokên DAIŞ`ê jî xebateke xwecihî-navdewletî ava bibe; da ku çareyeke domdar ji wan re bê ditîn, ev ne tenê ji bo parastina herêmê û gelên wê ye, lê belê ev di ber tevaya gelên cîhanê û paşeroja wan de ye. Mayîna zarokan heta demeke dirêj di kamp û navedên rehabîlîtasyon û guhdanê de gelek arîşeyên cuda û metirsîyan bi xwe re tîne. Her wiha dibe desteke ji DAIŞ`ê re ku stratejîya xwe ya avakirina artêşeke nû ji zarokan bimeşîne. Li nik wê jî, dihêle ku zarok bêhtir rastî binpêkirinan bibin, her mîna hînbûna îdolojî û fikirê radîkal, bikaranîna wan a zayendî û hêsanbûna tecnîdkirina wan di paşerojê de. Helbet berpirsê van metirsî û arîşeyên han welat û hikûmetên wan ên resen in, bi taybet welatên erebî yên ku xwe ji wergirtina welatîyên xwe yên di nava malbatên DAIŞ`ê de didin alî.
- Gelek astengî li pêşîya welatan hene da ku welatîyên xwe werbigirin, nemaze ne-naskirina Rêveberîya Xweser, û nexwestina hin welatan, bi taybet welatên erebî, pêkanîna danûstandineke rasterast bi Rêveberîya Xweser.

**Pêşinyar**

- Parastina karekterê sivîl û mirovî yê kampa Holê, derxistina malbatên DAIŞ`ê ji nav koçberên sûrî û penaberên îraqî, û jihevxistina beşê "muhacîrat", û veguhestina wan bo navendeke taybet bi wan, li gorî pîvanên navdewletî, da ku kontrolkirina wan a îdarî û ewlekarî hêsantir bibe û xeterîyên wan û zarokên wan bi dawî bibin. Her wiha gerek e valahî û lawazîyên li kampa Roj bên jinavbirin, çimkî DAIŞ ji wan sûdê dibîne, û

avakirina dibistanên taybet bi zarokên DAIŞ`ê yên îraqî û sûrî, û cudakirina malbatên DAIŞ`ê û malbatên sivîl ên sûrî û îraqî.

- Veguheztina zarokan ji kampên Hol û Roj di temenê wan ê 6 salî de, da ku di demeke zû de ji dayikên wan ên radîkal û tundrew bên bidûrxistin, û prosesa rehabîlîtasyon, guhdana bi wan û tevlîkirina wan di nava civaka normal de hêsantir bibe. Li rex wê, gerek bipêşxistina wan navenda di milê pisporên pêwîst di biwarê derûnî, tenduristî, perwerde û hînkirinê de were kirin. Her wiha bernameyên rehabîlîtasyonê û girêdayî parastina mafên zarokan yên pêşketî û di navbera alîyên xwecihî û navdewletî de hevbeş bên bicihkirin.
- Gerek e her bang li civak û rêxistinên navdewletî bê kirin ku berpirsyartîyên xwe yên di derbarê dosyaya zarokên DAIŞ`ê de bigirin ser milê xwe, û welatên wan zarokan ên resen welatîyên xwe ji jin û zarokan werbigirin.
- Ji xalên li jorê zêdetir, danpêdana sîyasî (naskirin) bi Rêveberîya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê dikare ji dîtina çareserîyeke ji dosyaya zarokên DAIŞê re li ser asta navdewletî û herêmî bibe destekek, û bihêle ku ew zarok li welatên xwe yên resen vegerin.